

BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELEN KURDISTANE LI SWED



Diyarbekir

7/84

NAVEROK

Jî bo salek serketi	3
Dan û Stanek	5
Lawîkê Nexweş	10
Hevpeyvin	12
Xo û Exlaq	14
Bo Xebata Çandi	19
Birindar û Çavê ş	20
Biranina Cigerxwin	22

XWENDEVANÊN HÊJA!

Ev hejmara 7'an hejmara dawi ya 1984'an e. Her sê hejma-reñ dawiyê (5,6,7) bi derengi dîghê destêñ we. Sedema wê, ji desttengiya me ya abori bû. Hejmarêñ me li Federasyonê li ser hev cîviya bûn.

Jî bo vê yekê li me biborin.

Xwendevanêñ Hêja!

Sala 1984 ji dawi hat em ketin saleke nû. Em hêvidarin ku sala 1985 bibe sala serketin û serfiraziyê ji bo gelê me û hemû gelêñ cihanê.

Biminin dî xweşiyê de.

BERBANG

Berpsîyar

S. FERMAN

Pergala Rûpelan

A. M. GILLY

Raxistina Nîvisaran

RÛŞEN

Redaksiyon

KEYXUSRO SİPAN

BENGİN BOTANI

A. M. GILLY

RÛŞEN FARQIN

BERBANG

Kurdisk tidskrift, utges av
Kurdiska Riksförbundet. Ansv-
arig utgivare och Redaktör:
S. Ferman. Layout: A.M. Gilly.
Sättning: Rûşen.

ADRESS

Kurdiska Riksförbundet,
RISSNELEDEN 55,NB
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN
TEL:08/984553

Prenumeration: Medlemmar
50.- kr/år Övriga 100.-kr/år.
Postgiro: 64 38 80-8

BERBANG

Kovara Kurdi, Xwedi Federasyona Komelên Kurdistanê
Li Swêd.
Buha: 5 Kron.
Abona saleke: 50 Kron, 30 DM.

NAVNISAN

BERBANG, Rissneleden 55.NB
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN
Tel: 08/984553
Postgiro: 64 38 80-8

S. ferman

ji bo salek serketi

Sala 1984, weke gelek salên buhuri bû salek zor û setem li ser gelê me. 1984 derbas bû çû, lê zordesti dawi nehat û ta ku ni-re kolonializmê, imperyalizmê neşkê dawi nayê.

Li Kurdistanâ Iranê û Iraqê gelê me bi salan e çek li dest bi mîrxasi şer dike, bi mîrxasi li hember ordi û çekênu nujen radweste, welatê xwe diparêze. Dijmin ji bi hoviti gund û bajaren Kurdistanê bombaran dikin, zaro, jin, kal pir bi hevre qır dikin.

Li Kurdistanâ Tirkiyê rewşa gelê me bi hatuna cunta faşist hê xeraptir bû, ji bo hêzên tekoşer qunaxek dijwar dest pêkir. Lîdan, kuştin giha gelqirinê. Li Hekarya, Sêrt dorberê gelê me hat girtin, kuştin, talan pêk hatin. Lî ji zindanê Kurdistanê dengen mîrasyî ji derketin, bê şik yênu ku bi ser kevin ew in.

Lê zor û zilma faşizmê ne tenê li ser gelê me, li ser gelê Tirkiyê ji bû zordestiyêk dijwar, li zindanan gelek kesen şoreşger pêşverû hatin kuştin.

Li Kurdistanâ Sûriyê ku ya heri nermturin tê hesibandin, hê gelê kurd ji mafen xwe yêner heri bin-gehin bêpar e, nikare bi zimanê xwe bixwine.

Her usa 1984 salek şerê yê ku navbera imperyalist, paşverû û welatên sosyalist karkeren welatên sermiyandar û hêzên şoreşgeren welatên bindest bê raberewam bû.

Li her aliye cihanê imperyalist zordestiyê, pêkanina hoyen şererek atomi ajotin. Dorava Grenada bi leşkeren Amerika yekbûyi (USA) li ber çavên cihanê bi zorê hat işgal kîrin, hikumeta pêşverû ji hukum hat xistin. Li dij rejima pêşverû li Nikaragua USA tehdidên vekiri kîr. "Em destûra Kuba'ke di nadin". Ni-

karagua ji çar ali hat girtin. Leşkeren dij şoreşê ji dorwelatêni Nikaragua êrisê vê welatê kîrin û dikin, ku rejima pêşverû biskinin.

Gelê EL Salvador bi destê van hova qır dibe. Bi dehhezaran kes hatin kuştin, zordesti gihaye deca wahşeti.

Li Afrika êrisê û sabotekirina aboriya welatêni pêşverû hatin ges kîrinê. Afrika Başûr a mijadperest bi hezaran Mozambiki kuştin. Bi xulamok û kuçikên xwe ve aboriya vê welatê sobote kîrin, û gelek zirarêni mezin gihadime vê welatê. Ev yeka li dij Zimbabwe ji hat pêk anin.

Li Asya İmperyalist, bi destê xwefiroşen paşverû êrisen xwe birim ser Afganistan. USA vekuri diyar kîr, di sala 1984 an de 250 milyon dolar daye hêzên dijmına rejima pêşverû.

Li Hindî Çin êrisen hov bi ser Vietnam û Komboçya hat ajo-tin, gel bi hev dan kuştin.

Li Rojhîlata Navin zordestiya Israil li ser gelê Lubnan û Filis-tinê bi hoviti hat ajotin. USA, bi hezar dek û dolaban dixwaze tekoşina gelê Filistin bike bin bandûra xwe.

Zordestiyen İmperyalist ne tenê li welatêni bindest û paşmayi pêk hatin û têni, her usa ew li welatêni xwe ji zor û zilmê didominin. Betali her roj zêdetir di-be. Her roj fabrika an cihkarek tê girtin. Kapitalist xwe effektif dikin, kar û xebatêni xwe'dibin cihen heri erzan û disa rekabeta navbera şirketên mezin ên dînyayê aboriya welatan dixim buhranen mezin. Li Ingilistânê li dor saleke karker di grevê de ne, kar û mafen xwe diparêzin, lê rejima paşverû bi polis, bi çek û lîdan bi ser wan de diçin. Bi hezar virr û hila dixwazin



mêrxasiya karkeran ji rûmet bixinin ji wan re dibêjin zorkar, anarşist. Lê piştgiriya navnetewi bî xurti weke grevê dîdome.

Lî her derê Ewrûpayê li dij şereki atomi, li dij hoviti û çavşoriya NATO yê daxûyanîyê protestoyê pêk tê. Dî 1984 an de ji bî sed hezaran aştixwaz li hev civiyan. Bi sedema ku hêzên aştixwaz ji hêz bixin imperyalist, bi radyo, televizyon, rojname vir belav kîrin, ku Yekitiya Sovyet weke "êrişxwaz" nişan bîdm. Her roj li ser derewe-

ke qiyamet rakırın û radıkın. Bêşik rawestandına li dij şereki atomi, parastina hemû insaneti yê ye.

Lî welatê me ji bî destê NATO yê çekên gîran yêni atomi hatin bî cih kîrin. Dixwazin welatê me ji bikin parezgeha menfieta xwe, bikin ê rişgehek li dij welat û hêzên sosyalist- pêşverû. Rejima zordesten sermiyandar, cûnta faşist a Tirkî hem li welatê me hem ji Li Tirkîyê bî daxwaza emperyalistan ve êrişen hovdibin ser gelan.

Serê ji bo wekhevi, mirovi, aza-di, serxwebûyi dî 1984 an de li her derê cihanê dom kîr. Ev şer 1985 an de ji dê bîdome. Dê gelê kurd ji wek hemû gel û çinê bindest şerê xwe bîdome. Bi hêviya ku 1985 bibe sala serkeftinê, serfiraziye ji bo gelê me û ji bo hemû gelên cihênenê.

JI BO SALEK NÛ
SERSALA WE PIROZ BE!

TÊ RAST KIRIN

Dî Hejmarê n 5 û 6 de rûpelê navin bî xeletiya çapxanê çewt hatibûn bî cih kîrin. Anglo nivisa H.C, "Mamoste Cigerxwin li Qamışlo dî hewşa mala xwe de hat veşartîn"(hejmar 5) û "Stockholms länsländsting agahi dîde" (H.6). Her usa dî nivisa F. Ceweri ya "Girtî" (H.6) de dî şûna "Jî dengê xirîna (xirxira) polisê ku li ser qoltixê razayî bû pê ve tu deng ji hundîre polis-xanê ne dihat" bî çewtî "jî dengê qirîna polisê ku li ser qoltixê" hatîye nivisandin.

Dîsa di hejmar 5 rûpel 14 de Remo Şêxo weki endamê politburoya Partîya Komunist a Iraqê hatîye nivisin. A rasti endamê Politburoya Partiya Komunistê Suriyê ye.

Dî nivisa Zinarê Xamo de ya "meriv ji bo Cigerxwin ci bîbêje hêja ye" (hejmar 5) stûna ewil bê ku kumikêñî bêñ çêkirin hatîye weşandin. Disa di vi nivisê de rûpelek bî şasiti kêm giha bû destê me, ji bo wê yekê ev nivis dî xwendinê de ji bî beteki ji hev dûr dihat fêm kîrin. Divê ya rasti ji rûpel 21 stûn 3 rêz 2 wulo bîdome:

û melayêne kewneperest ji dujminatiya Cigerxwin dîkinin û ew "kafir" lan kîri bûn. Jî ber ku wî xeliya ser wece wan radi kir û ruyê wanî rastin raberî gel dîkir.

CIGERXWÎN LÎ DIJ BÎNDESTİYA JÎNAN BÛ

Di helbesten Cigerxwin de gelsa jînan ciyekî gelek mezin digre. Û wî di hemû helbesten xwe de wekheviya peyan û pîrekan parastiye, li dij bîndestî û firotina jinan derketiye. Wî di xwest ku jîn jî, xwediye hemû mafîn demokratik û siyâsî bin û di hemû warêni civakî de ciyê xwe bigrin. Ji ber ku wî baş dizanî bû, dema jîna kurd di xebata siyâsi de ciyê xwe negre, wê nîvî civakî li derî xebat û tekçûne bimûne û bi vê yekê jî wê rizgarbuna gelê kurd pêwîst nebe. Lewrajî wî, her gazî li jînên kurd dîkir, ku ew jî bîxwînin, zana bibin û bi peyên xwe re li dij hêzên mîtingehkar tekçûne bidin.

Bî kurtayî metiv dikare bêje ku Cigerxwin, di şerê rizgarbuna jinan de serkeşî kir û ev bir û bawerî bi xurtî parast. Di warê rizgarbûn û serbestiya jinan de wî, tu qeyd û merbend nas ne kîr. Anglo wî xwest ku jîna kurd, "di ser de wek şeran be û di dansê de jî pa-dişaha rîndan be"

CIGERXWÎN Û BAWERMENDÎ

Cigerxwin jîyanek dûr û direj derbas kir. Dî vê jîyanâ xwe de wî, gelek dijwarî, qetiliamên bi girseyî û tekçûnen serînildanen û tevgeran dî. Lê belê wî, tu carî hêviya xwe, baweriyaxwe ya bi gel û xebata siyâsî wenda ne kîr. Ew hetanî 81 saliya xwe jî dî nav xebata siyâsî de ma û di nav rîexistinê de berpîrsiyarî kir, ûvatînî girt ser milêni xwe. Wî jî wek hînek kesan ne got' Edî ez kal bûme" yan îf "Ey xebat naçe serî" û dev ji xebata bi rîexistinî berneda. Wî, bê westan wek xortekî çarde salî di nav xebata rîexistinî de hetanî roja mirina xwe jî bi aktifî tekosîn da û xebat kir. Ji ber ku wî jî, wek hemû kesî dizanî bû ku, serkevtin û xelasî bi rîexistinî dibe: "gelê bê rîexistin, gelê kole ye" Ew jî dikarî bû biçuya li mala xwe rûnişta û bigota "Ez merivekî hûnermend im, helbestvan im, ji min re karê rîexistinî ne pêwîste". Lê wî tu carî wîsa ne got û wîsa ne kîr. Ji ber ku wî

baş dizanî bû ku xebata rîexistinî, li ber xebata edebî ne bende û wê paşde na xîne. Ji xwe ew bi xwe û eserên wî ji vê yekê re mîmakek gelek berbiçav e.

Jî bo van şâşyan li me bîborin
Berbang

AGAHDARI

DAN Ü STANEK

lî ser zaro û malbatı
lî swêd

STATENS INVANDRARVERK



WERGER : REŞO ZILAN

Binefş : Roj baş!

Sosin : Roj baş xwîskê!

B: Navê min Binefş e. Lê navê te bi xêr?

S: Xêra Xwedê li tebe, navê min jî Sosin e. Ma tu jî li vê taxê dimînî?

B: Belê, ez jî li vê taxê rûdim. Ez ne ji zû de ye, ku hatime Swêdê. Ev çend meh in ku ez li vir im. Gelo ev çiqasî te ye ku tu li Swêdê yî?

S: Hîç ne pirse xwuşkê, ev emrek e. Ev bûn tam 9 salê min ku ez li Swêdê me.

B: Ma zarokên te hene?

S: Belê destê te radimîsin, 2 zarokên me hene.

B: Bila bi dê û bav mezin bibin! Navê wan ci ne?

S: Navê yekê Gulîzar û navê yê din jî Gernas e. Gernas diçe sinifa didwan û ya din jî vê gavê diçe zarokxanê.

B: Bila Xwedê ji we re bihêle! Ez gelekî kêfxweş bûm, ku me hevîdu nas kir. Eger rastiyê bipirsî, hin tişt hene ku dixwazim di derheqa wan de ji te pirsina bipirsim. Pirsêñ min hemû di derheqa Swêdê de ne. Ez ê pir dilşa bibim ku tu bersivêñ pirsêñ min bidî min piçekî ronahî bikî.

S: Ser çavan ! Tiştê ku ji min bêt, ez ê bikim û bersivêñ pirsêñ te bi dilekî xweş bidim.

B: Erê tu bi Xwedê, xuseta van Swêdiyan çawan e? Bi xwe, dan û standinê min bi wan re pir tuneye. Bi tenê ev çend car in ku ez silavxêriyê li cîrânê xwe didim û min carekê jî jinek banî qehwe kir û hew.

S: Eêê, te ew çawan dît?

B: Himmm, ew piçekî şermoke û bêdeng bû.

S: Swêdî pir caran sar û bêdeng in. Mirov divê bi xwe hewl bide, da ku wan nas bike.

B: Ma gelek nasêñ te yêñ Swêdî hene?

S: A rastî, gelek wext girt heتا ku min hin Swêdî nas kirin. Mirov divê cara pêşîn xwe hîni zimanê swêdî bike. Bê guman, ew ê gelek wextê te bigire, lê disan jî dest jê bermede. Niha divê tu navê xwe li kurseke hînkirina zimanê Swêdî bidî nivîsandinê. Li alîkî din jî, divê tu bi riya guhdarîkirina Swêdîyan ,ku ka ew çawan di dikanan de, di radio û televizyonê de dipeyivin, li

gor wê zimanê xwe meşq bikî. Di destpêkê de, gava ku mirov koçî wenatekî nû dike, mirov xwedî meraqekî mezin e, da ku tiştêñ nû hin bibe û tiştêñ nû nas bike. Ji ber vê yekê, pir giring e ku mirov hîn di destpêkêde pûte û sexbîriyê bide zimêñ. Heke mirov demeke dûr û dirêj bisekine û rabiweste, heye ku destpêkirina wê dijwartir bibe.

B: Malava, vêca pêşî vî emrî divê ez herim xwendegehê jî? Ma ew ne bi tenê ji bo zarok û xortan e?

S: Na, ev li Swêdê tiştekî pir normal e, gelek Swêdîyêñ nav-sale diçin kursêñ curbicur. Ji bo biyaniyan gelek kursêñ cihê ci-hê hem ji bo hînbûna zimanê swêdî û hem jî ji bo biyaniyêñ ku neçûne xwendegehê û xwe hîni xwendin û nivîsandina zimanê xwe yê zikmakî nekirine, têñ li dar xistinê. Pişti ku tu zimanê swêdî hîn bûyi, tu dikarı herî kurseke pêşeyî û meslekî.

B: Ango ez dikarim li vir, li Swêdê, xwe hîni nivîsandin û xwendina kurdî bikim?

S: Belê tu dikarı. Hem swedî jî.

B: Heyran, hema bila tenê

zarokê n min herşn xwendegehê , xwe perwerde û hîmî tiştekî bikin, bes e.

S: Naaa, ev tiştekî ne rast e. Madem ku tu li vî welatî û di vê civatê de dijî, pir girîng e, ku tu bal û dênen xwe bidî xwe jî. Yan na , bi a min,dê hem ji malxweyê te re û hem jî ji zarokê n te re dijwar û çetin bibe.

Haaa, te berî niha pirsî ku ka Swêdî çilo ne . Swêdî wek me Kurdan ne mîvanperwer in. Her çilo dibê , berî ku mirov wanqenc nas neke, ne hinde

merd in. Mirov divê berî her tişti bi sebr be û wan wek li cihê kar yan jî bi saya zarokxanê yan komelekê , demeke dûr û di-rej nas bike. Min jî bi vê riyê malbateke Swêdî nas kir. A rastî, bi xêra keçikên me yêñ ku diçin eynî zarokxanê , me hevûdû nas kir. Navê keçika wan Maria ye û navê dê jî Eva ye. Min û Eva yê , me di nava heftê de rojekê ger û seyranek ji bo dê û bavan û zarokê n wan yêñ li zarokxanê li dar xist. He-

valtiya me, ji wê wextê de dest pê kir. Ji wê rojê vir de, malbatên me gelek caran tevî xwari-nêñ xwe derketin çolê , ger û seyranan.Kêfa Swêdîyan geleki ji derketina der û çolê re tê t.

B: Naaa, ez di wê baweriye de bûm ku Swêdî her gav bi çûn û hatina karê xwe ve, bi hûrû-mûr kirînê ve yan jî bi çêkirina tiştûmiştan ve mijûl dibin.Welê xuya ye ku bi lez û bez in jî. Her çawan be, li cihê ku ez lê dimînim holê xuya ye. Di xani-yê ku ez têde me, gelek jînêñ bi tenê serê xwe yêñ bi zarok di-mînin, hene. Ew her tim mijûl xuya ne. Tu dibêjî qey mîren wan tu carî nayêñ malê .

S: Dibe ku ew bi tenê serê xwe bin. Ev li Swêde tiştekî pir normal e. Ew yan ji malxweyâ yêñ xwe veqetiyane, yan jî hîç bi bavêñ zarokê n re rûneniştine.

B: Baş e wê çaxê çima ew bi dê û bavêñ xwe re namînin.

S: Na , ev li Swêdê ne tiştekî normal e. Piraniya wan dixwa-

zin ji xwe re bibin xwedîya ma-lekê . Bi xwe hem kar û barêñ xwe û hem jî idara xwe bikin. A rastî, ev hem ji bo kesen ciwan û hem jî ji bo yêñ pîr we-ha ye. Yêñ kal û Pîr jî bi tenê serê xwe dimînin.Lê di rojêñ betlanê de mermalêñ xwe dibî-nin.

B: Ma ne ne xweş e, ku mirov tenê bimîne?

S: Dibe ku ne xweş be. Lê belê , ez wilo bawer dikim, ku civata Swêdî , ango civateke endustrî ya modern , teşwiq dike ku her kes idara xwe bi xwe bi-ke. Bi xwe li karûbareñ nav ma-la xwe binêhire, bi tişten ku ew bi xwe hewesê jê digire ve mijûl bibe. Bi xwe ji xwe re hevalina bibîne.

B: Lê , hemû bi tena serê xwe namînin.Mirov, nemaze di rojêñ betlanê de, gelek malbatan dibîne.

S: Belê çawan. Piraniya wan bi malbatî dijin.Zarokê n wan pir kêm in.Bi tenê yek yan jî du



zarokêñ wan hene. Malbatêñ Swêdî, nemaze malbatêñ ku xwedî zarokêñ piçûk in, wexta xwe ya vala bi hevûdu re diborînin. Di rojêñ betlanê de, hemû malbat bi sporêñ cihê cihê ve mijûl dibil. Derdi Kevin der û çolê. Lîstikna dilîzin û bi zarokan re dilîzin û şâ dibil. Kesêñ ku dixebeitin hemû xwedî maşê vehisîna pênc hefteyî ne. Ew dikarin wexta xwe gelekî bidin hevûdu û bi hevûdu re biborînin.

B: Gelo wê çaxê ji Swêdîyan re ne ecêb e, ku em hevqasî bi ser mermalêñ xwe de diçin û têñ û ji wan re xwedî derdi Kevin?

S: Na, ez bawer nakim, ne niha hemû kes dikare ji civatê alîkarîyê bistîne. Heke kesek bê pere û bê pûl bîmine, yan ji di nav malbatê de derdek û sergêjiyek derkeve, dikare ji Daîra kar û barêñ Civakî alîkarîyê bistîne.

B: Erê ev Daîra Karûbarêñ Civakî ci ye? Ew ci karî dike?

S: Li Daîra Karûbarêñ Civakî hin mirov hene ku ji aliye Belediyê ve wek memûr û karmend li wir hatine tayîn kirinê. Ew ji bo alîkarîya mirovêñ ku di hevîma wê Belediyê de rûdinêñ, dixebeitin. Herweha ji bo pêşkêşkirina xizmet û servîsêñ cihê cihê xwe diwestînin. Ev wek lê-nêrîna mirovêñ kalûpir, yan ji lê-nêrîna mirovêñ seqet e. Ev karûbarêñ çavdêriyâ zarokan, yan ji ji bo zarok û xortan li-

darxistina mijûliyêñ dema vala ye. Ji bilî vê, ev ji bo kesêñ desteng ku nikarin idara xwe bikin, alîkarîya aborî û pere ye ji.

B: Ev hema mîna tiştêñ ku em mermalêñ hev ji hevdü re dikin e.

S: Belê, berî niha li Swêdê ji wisan bû, berî ku xelk ji gundan koç bikin, werin bajaran û lê cîwar bibin, Lê piştî ku Swêd bû civateke endustrî ya modern, êdî civatê bixwe berpirsyarîyêñ kar û erkêñ holê hildan ser mi-

lên xwe.

B: Erê tu bi Xwedê kî, çavdêriyâ zarokan çawan tê te li dar xistin?

S: Li hemû Belediyan Zarokxane hene. Carna dibe ku di zarokxanan de cih bi dest nekeve. wê çaxê divê mirov navê xwe li dorê binivisîne û bipê heta ku dora mirov têt. Di zarokxanan de cihêñ heyî didin dê û bavêñ ku dixebeitin yan ji dixwînin. Niha eger tu herî xwendegehê û dest bi xwendinê bikî, tu dikarî ji bo zarokêñ xwe muraceat bikî da ku li zarokxane kê ji wan re ciyekî bibînin. Tu muraceata xwe didî Daîra Karûbarêñ Civakî.

B: Zarokxane çiye û zarok li wir ci dikin?

S: Belediye zarokxanan çêdike. Zarokxane, dibe ku di xanîkî mezin de, qatek be, yan ji avahîyeke bi serê xwe be. Ew, dibe ku bi qasî dibistanekê mezin be û bi qasî wê ji zarok tê de hebin. Yan ji dibê ku piçûk be û cihêñ bi qasî 15 zarokan tê de hebin. Personalêñ zarokxanê kesêñ xwende û zane ne. Zarok berî ku dest bi dibistana rastîn bikin, diçin van zarokxanan. Lî cih ji hemû zarokan re di zarokxanan de tune ne. Lî belê cih ji hemû zarokan re di dibistana berî destpêkê de heye. Ev dibistan ji zarokêñ 6 û carna ji zarokêñ 5 salî re ne. Zarok rojê sê saetan diçinê. Hem personalêñ dibistana berî destpêkê û hem ji yêñ zarokxanê li zarokan dinihîrin. Guh didin wan, bi wan re hem li hindur û hem li

derve dilîzin. Xwarina wan di din wan û bi awayen cihê cihê wan hînî tiştina dikin, da ku ew karê bi xwe bibin serî. Ji bo zarokêñ Kurdan mamostek heye, ku bi wan re kurdî dipeyive, distirê û dilîze da ku kurdiya zarokan baştır û xurtir bibe. Zarokxane ji rojêñ duşemban heta înyan, di navbera saetêñ diyar kirî de, piranî ji saet 7'ê sibehê

heta 6'ê êvarê, vekirî ne. Dema ku dêûbav diçin kar yan ji xwendegehê, dikarin zarokêñ xwe dayînin zarokxanan.

B: Gelo kêfa personêñ Swêdî ji zarokêñ me re têt û ji wan hez dikin?

S: Belê ew bi awakî rast û ji dil li wan dinihîrin û guh didin wan. Lî bê guman, carna dijwari û zehmetiyêñ zimêñ, tore, rabûn û rûniştinêñ cihê cihê rolinâ dilîzin. Yêñ ku di vî warî de zehmetîyan dibînin, bê şik, zarok in. Swêdî bi xwe hîn bûne, ku em kesêñ mezin û navsale çilo serhiş, sert û girtî ne. Lî ew li hember zaroken bêtir dilgerm, nazik û kubar in. Gelekî girîng e, ku em alîkarîya zarokêñ xwe bikin. Bi wan re bipeyîvin û wan tê biglinin, ku Kurd û Swêdî ne mîna hev in. Yan na, zarok nikarin bizanin ku ka divê ew çilo hereket bikin, rabin û rûnin.

B: Baş e heke hereket, rabûn û rûniştinêñ ne baş in, em ê çima zarokêñ xwe tev li yêñ wan bikin?

S: Gelekî hêsan e ku mirov hema wilo zû û di cih de çanda perwerde û mezinkirina zarokan ya gel û miletékî din meh kûm bike. Berê, çaxa ku Swêd civateke cot û cobarîyê bû, zarokêñwan hema wek yêñ me dihatin perwerde û mezinkirinê. Lî di van dehsalêñ dawîn de, hem civat û hem ji perwerde û mezinkirina zarokan gelekî hatin guhartinê. Dê û bavêñ Swêdî û mamoste ji di wê bawerîyê de ne, ku ev pirs û pirsgirêkêk e. Lî dîsan ji, divê em Kurd xwe biparêzin, da ku di bin bandora nimûniyêñ negatif û nebaş, mibalexe û nerast de nemînin. Divê em hin aliyeñ baş yêñ tiştêñ Swêdîyan ji xwe re werbigrin û hin alîyeñ toreyen xwe yêñ ku ji zarokêñ me re baş in, biparêzin û bihelin.

B: Lî belê, gava ku zarok li dibistanê ne, gotinêñ mamos-têñ xwe naşikênen û bi a wan dikin, ne wilô?

S: Dibistanê Swêdî, ne wek dibistanê ku em pê dizanin wi-san sert û bi disiplin in. Bi lê-dan lê xistinê vê cezakirina şagirtan bi temamî qedexe ye. Ji bo gişt kar û xebata dibistanê gelek qâide, qeyd û bend hene. Gava ku zarok nexweş dikevin û nikarin herin dersê, divê mirov dibistanê agahdar bike. Ji bo vê ji divê mirov yan telefonî ma-mostê zarokan bike. Yan ji serê sibêhê telefonî dibistanê bike û ji wan re bêje ku zarok nexweş in. Wekî din, li dibistanê hatiye kifş kirin, ku divê mirov di kijan dersê de Çiqasî bixwîne. Zarok dikarin di heftê de çend sa-etan zimanê kurdî bixwînin. Dersêñ dibistanê yêñ ku li Swêdê xweser û taybetî ne, ev in: Karê destan yê daran, yê teksîlê û herweha dersa tebîtetê ku carna li derive, li çolê, vê dersê dikin da kû şagirt gîha û heywanêñ cihê cihê nas bikin. Di der-heqa van de xwe hînî tiştina bikin. Spor ji, wek bi fitbol û go-lingê listîn, xwe bi patîn û palikan ve şemitanin, xwe hînî so-bahû û ajnê kirin dersekê taybe-tîye. Mirov li Swêdê heqê dibis-tanê nade. Ango ew mift û belaş e. Zarok nava rojê firavîna xwe ji dixwin.

B: Ma zarok kengê dest bi dibistanê dikin?

S: Gava ku zarok heft salî di-bin dest bi dibistanê dikin. Di-bistana mecbûrî 9 sal in. Pişti vê

mirov dikare here lîseyê. Pirani-ya şagirtan diçin lîseyê, ji ber ku pişti bi tenê xwendina 9 salan, kar bi dest xistin dijwar e û çetîn e.

B: Belê... Lê zarokê min ne heft salî ye. Ew, ango Baran, hin 3 salî ye. Hê gelek ji wî re heye ku dest bi dibistanê bike. Ez vê gavê bi halekî me û xwedê zarokekî din bide min. Bê mane, hîn hewqasî xuya na-ke, lê ew ê li Swêdê bibe.

Ez niha de xeman dixwim û nizanim dê çawan bibe? Ne xwişkên min û ne ji dayîka min

li vir in, da ku di welidandinê de hazirbibin. Ez bawer im, dê ez feqîr û stûxwara Xwedê li nexweşxanê tenê bibim û tiş-têñ ku ew bêjin ji qet fêm ne-kim û tê negihêm.

S: Ma tu qet çûyî Cihê Lînê-rîna Dayikan?

B: Na, ez hîc neçûme. Lê ez naê şim ji: Wek cara berê xuya ye. Ez bi tenê piçekî westî me.

S: Lî, her ci be, dîsan ji divê tu herî Cihê Lînê-rîna Dayikan. Li Swêdê herçendî mirov neê şe ji, divê mirov navê xwe li wir binîvisîne û di dirê jahîya dema ducaniyêde here wir û xwe li wir bide kontrol kirinê. Li wê, pîrikek tenduristî û saxlemî ya te û herweha bi awakî rast û dirist mezînbûna zaroka te kontrol dike. Mirov xwe pê pişt rast û piştqewîn dibîne. Dinya ye, heke bi te re yan ji bi zaroka te re tiştek peyda bû, dikarin pêşiyê lê bigrin.

B: Ma Cihê Lînê-rîna Dayikan cureyek nexweşxanê ye?

S: Ni bi temamî. Li wê ten-duristî û saxlemîya jinêñ ducanî kontrol dikin û di dergeqa tiş-têñ cihê cihê de, wek li ser tiş-têñ ku pêşîya zarokçê bûnê digrin, ango tiştêñ prezervatif, şire-tan didin mirov. Mafê jinêñ hem bi mîr û hem ji bê mîr heye, ku tiştêñ prezervatif werbigrin. Herweha mafê wan heye ku di nexweşxane kê de za-rok ji ber xwe bigrin. Her jinek xwedî maf e ku bi sere xwe bir-yareke wisan werbigire. Serdana Cihê Lînê-rîna Dayikan, ya Ci-hê Lînê-rîna Zarokan û herweha li nexweşxanê welidandina za-rokan mift û belaş e.

B: Lî li Cihê Lînê-rîna Dayikan çawan dikarin ji min fêm bikin û tê bigihêñ?

S: Cihê Lînê-rîna Dayikan ji mirov re tercumanen kurdî pey-da dike. Gava ku tu ji bo serdanê diçî wir, bêî ku tu şerm bikî, dikarî li ser tiştêñ ku tu dixwazî bizanibî, bipirşî û di derheqa muayenêñ ku dikin de, te rona-hî bikin. Dema ku tu mecbûr di-

bî ku bi daîren resmî re bidî û bistînî, mafê te heye ku tu ji tercumanan alîkarîyê bistînî. Lî zimanê Swêdî di ser guhêñ xwe re navêje! Ku tu Swêdî hîn bûyî, dê tu baştir fêm bikî tê bigêhêyî ku ka ci dibe, ci di-qewime û ev civat civateke çilo ye. Hertim daîren resmî, Cihê Lînê-rîna Zarokan, Daîra Kar û Karker Peyda kirinê yan ji Daîra Karûbarêñ Sigorta Nexweşîyê ji te re tercuman dibîne. Tu divê berî ku herî serdanê ji wan re bêjî, ku te tercuman di-vê. Tu divê di wexta ku dane te de, herî. Heke tiştin bibin û bi-qewimin ku rê li çûyina te bê te girtinê û tu nikaribî herî wexta xwe, divê tu ji wan re telefon bikî û bêji.

B: Gelo tercuman Kurd e?

S: Belê. Gelek Kurd hene ku hinde xweş hînî zimanê Swêdî bûne û civata Swêdê hinde baş naskirine, ku dikarin turcumanî yê ji bikin. Ji bili vê, ji bo ke-sen ku bixwezin tercumanîyê bikin, kursen xwendin û xwe-hînîkirinê ji hene û mirov dikare tê keve azmûn û testekê, da ku dibe tercumanê xwedî kesname û resmî. Tercuman gişt xwedî berpirşîyar in, ku sir veşérin. Ango, ew nikarin tiştêñ ku di dema wergerandin û tercumekirinê de ji wan re têñ gotinê, ji kesekî din re bêjin, û hewal bi-din.

B: Hebûna tercumanan tişte-kî gelekî baş e. Wê çaxê ez di-karim ji bo her tişti ji wan alî-karîyê bistînim.

S: Belê, wisan e. Lî divê tu bizanibî, ku xwe bi xwe karê xwe qedandin û birin serî ve, mirov bê tir dilrehet û këfxweş dibe. Di destpêkê de bi riya tercumanan peyvin, derd û pirsen xwe gotin û anîn zimêñ, tiştekî zerûri ye. Herweha dibe ku paşê ji, nemaze di danûstandinêñ bi daîren resmî re, ku gava tu mecbûr bi tiştêñ gelekî zor fêm bikî û tê bigihêjî, herweha da ku tu bikaribî derdê xwe bi nûans bînî zimêñ, tercuman bikaranîna te

zerûrî be. Lê dema ku tu xweş hînî zimanê Swêdî bûyî, dê kêf û sebra te bêtir li vi welatî bê. Wê çaxê dê rê, îmkan û danû-standinê nû derkevin pêşberî te. Gava ku tu li vir, li Swêdê, silavê bidî hin kesan, divê tu bêjî; "... goddag", yan jî "Hej", ango roj baş! Niha tu dikarî weha bêjî; "Hej jag heter Binefs", Ka tu vê ca bêje!

B: "Hej! Jag heter Binefs".

S: Gava ku tu bixwazî bêjî de xatirê te, divê tu bêjî; "Ad-jö" yan jî "Hej dâ". Ka vê ca tu bêje!

B: "Hej da Sosin!"

Baş e heke ez bixwazim hin bîrinc û kîloyek şamik bikirim, di-ve ez çawan bêjim?

S: Tu divê wê çaxê weha bêjî; "Jag vill köpa rîs och ett kilo tomater". De ha niha tu bêje!

B: "Jag vill kopa rîs och ett kilo tomater". Baş e mirov - Ev bi ciye - Çawan dibêje ?

S: Mirov dibêje ku: "Hur mycket kostar det? " De ka nuha tu bibêje!

B: "Hur mycket kostar det?"

"Hur mycket kostar det?"

"Hur mycket kostar det?"

S: Heke tu dil hebe, ku tu çend zarokên din jî binî, tiştek heye ku divê tu bizanibî. Dibê ku tu di pêşde ji xwe re karekî bibînî. Wê çaxê mafe te heye, ku tu ji karê xwe ıznê bistînî, da ku hem zarokên xwe binî û hem jî bi qasf şeş mehan, li malê, li wan binihêrî. Wê gavê Da-îra Karû barê Sigorta Neweşî-yê mecbûr e, ku mûçe meşa te wek tu ji cihê kar distînî, bide te. Qaide, şert û mercen wê pir tevlihev in. Lê , tu dikarî ji Da-îra Karûbarê Sigorta Nexweşî-yê bêtir agehî û enformasyon werbigri. Tu herweha dikarî ji Biroya Karûbarê Biyanîyan jî bipirsî. Biroya Karûbarê Biyanîyan li gelek beledîyan hene û mirov li wir dikare di dergeqa pirs û pirsgirekîn cihê cihê de aîkarîtyê bistîne û şireta bigre.

Personalen ku li wir dixebeitin, hînî aîkarîya biyanîyan bûne.

B: Gelo di civata Swêdê de cih û pozisyonâ jinê Swêdîyan çî ye? Aya ji ya jinê Kurdan cihê tir û cudatir e?

S: Belê divê mirov bêje ku cihê û cudatir e. Sebebê herî mezin jî ew e, ku nemaze di van 20-30 salen dawîn de hejmara jinê ku idara xwe bi xwe dikin zêdetir bûne. Ew, ji aîsiyê aborî

de êdî ne girê dayî mîr û mermalê wê xwe ne. Ev jî ji wan re rê vedike, da ku bikaribin li deriveyî malbata xwe bibin xwedî jî-neke serbixwe, bibin xwedî kar, bikaribin bixwînin, di demen xwe yê vala de ji xwe re mijiliyan bibînin û ji xwe re kîfî bikin. Di zewacê de mana vê serbixwebûnê ji jinan re gelekî mezin e. Jin û mîr li hember hev xwedî eyî man, erk û wezife ne û berpirsiyariya wan ya li hember zarokan jî mîna hev e. Herdûk jî mecbûr in, ku li gor karîn û qaweta xwe aîkarîya idara malbatê bikin. Heke jin li malê bixebite ev xebata wê jê re wek karekî tê hesab kirin û ji lewre mafê wê heye ku perê wê jî hebe.

B: Ango tu dixwazî bêjî, ku mafê herdûkan jî heye, ku li ser her tişti bi hevre biryarê bidin.

S: Belê, lê heye ku gelekî zehmet be. Lê dîsan jî, di birtyarda-na di derheqâ jîna malê û tişten malbatê de heq û mafê mîr ji yê jina xwe ne zêdetir e. Hemû kesen mal û malbatê divê qedr û rûmeta hevdu bigirin û bizanibin. Ji bilî vê, li gor qanûnê jî li zarokan xistin, li jinan xistin û bi zorê tev jinan razan qedexe ye. Heke mîrek van tiştan bike, mirov dikare gîlîye wî li ba polîs bike. Li Swêdê, jibo tişten weha ceza didin mirov.

B: Heke li vir, li Swêdê ,jin yan jî mîr bixwaze veqete, çawan dibe?

S: Jin û mîren ku li ser hevduberdanê li hev tê, bi şertê ku zarokên wan yê ji 16 salan

bîçüktir tune bin, dikarin hema di cih de ji hevdu veqetin û hevdu berdin. Lê heke zaroken ji 16 salî bîçüktir hebin, divê heta şeş mehan bifikirin û bihizirin. Heke bi tenê mîr yan jî jin bixwaze veqete, piştî şeş mehan fikirin û hizirîne maf û heqê wî yan jî wê heye.

B: Baş e, ci bi zarokan dikan?

Kê ji wan xwedîkirinê hildide ser milen xwe ?

S: Dê û bavênu ku ji hevdu veqetiyane disan dikarin zarokan bi hev re xwedî bikin. Ango ji bo perwerde û mezinkirinê, idare û danxwendinê herdük jî berpirsiyâr in. Heke dê û bav li ser hevdu berdanê li hev neyê, wê çaxê Dadgeha Destpêkî li ser biryarê dide, ku da dê kî ji wan zarokan xwedî bike.

B: Heke Dadgeha xwedîkirina zarokan bispere diya wan, gelo wê çaxê idarekirina wan ji jineke bi tena serê xwe re zor na-be?

S: Lê bav wê çaxê dîsan mecbûr e, ku aîkarîya idara zarokan bike. Ew divê her meh tibabek pere ango nefeş tespitkiri, bide zarokan. Herweha heq û ma-fê wî heye, ku zaroken xwe bibîne.

B: Lê heke jineke Swêdî ji mîr xwe veqete û tevî zarokan bi tena serê xwe bimîne, nas û dost û mermalê wê, wê tecrit û izole nakin?

S: Na, kêm caran wilo diqe-wime. Ev êdî di nav Swêdîyan de bûye tiştekî gelekî normal. Lê ez jî di wê baweriyê de me, ku ev ji bo jineke Kurd zehmet û dijwartir e. Mirov divê vê ye-kê baş bizane û li ser qenc bifikiire û bihizire.


B: Spas û mala te ava! Ez gelekî kîfxweş bûm ku em rastî hevdu hatin. Bi rastî ez ji te hî-nî gelek tiştan bûm.

S: Spas û mala te jî ava xwişkê! her ci gava ku tu dixwazî, disan kerem bike.

B: De bi xatirê te!

S: Ser çavan û oxir be.

LAWIKÊ NEXWES



Firat Ceweri

Dilê mîrik bi rewşa wî şewitî û bê hemdî wî çend dilop hêşir ji çavan hat. Hêşirênu ku ji çavan hat, di ser riwê wî ê bi rih de herikî ser simêlê wî ê gur û qalind. Ji roja ku wî bîr biribû heya fro tu caran negirîyabû. Ji xwe li cem wî girî ji peyan re şerm bû. Girî karê pîrekan bû. Lê ew di wê deqîqê de têgîhist, ku peya jî kanin bigirîn û dilên wan jî diê şe.

Jina wî ya ku ji kerban û ji girî nîkanibû di cihê xwe de rawestîya, ber bi wî çû û bi stûxwarî jê re got:

— Ma tu dibêjî em çawan bikin lo? Em ci awayî ji vî lawikî re çê bikin? Mîrik serê xwe vir de û wê de hejand û bê keser got:

— Ez nizanim!

Jinik îcar bi dengekî bilind girîya û got:

— Ma ku tu nizanibe, kî ê zani be? Ma ez ê bi vê pepûkîya xwe zanibim?

Mîrik tu bersiv neda. Weke zarozan kire îskîn û bi pişta destê

xwe hêşirênu xwe paqî kir. Ji bo ku girîyê xwe bisekinîne cigarek vê xist. Lê girîyê wî nesekîni. Çend caran diranênu xwe qîrîçand û bi pistinî tiştin got. Herse jî digirîyan' Lê ê mîrik tenê hêşir ji çavan dihat. Dengê girîyê wî weke ê jina wî û layê wî nedihat. Pişti ku cigarek din jî vê xist got:

— Mîratê niha ku gundbûya, min ê biçûya xwe biavêta camêrna. Qe çawan bûya me ê awak çê bikira. Lê bajar e, ka ez ê xwe biavêjîm kî ha! Ez ê ci bikim?

Biskî deng ji herduwan hate birîn. Lê lawikê nexweş her digirîya. Carna jê ji nişkê ve qîrin pê diket û li ser piştê lal dima.

Şev dereng bûbû. Saet sê-çarê şevê bû. Donê ku di lampâ wan de mabû dawî hat (qedîya, xelas bû) lampê sê-çar caran li ser hev kire pit-pit û agir bi fitîlê ket. Pir tê de neçû vemirî. Hundire xênî bi yek derbê re tarî bû.

Gava ku lampe vemirî, mîrik ra-

Java ku ketin nav nivînan, dîsan dengê girîyê lêwik hat. Diya wî zû ji nav nivînan xwe rabû û pêşîra xwe xiste dev. Lê lawik bi pêşîre jî aş nebû. Wî qet devê xwe neda pêşîre. Wisan digirîya ku carna lal dibû. Jinikê lihêfa mîrê xwe ji ser çavênu wî avêt û bi ser de qîriya:
— De rabe ha! Qe tu rabe awakî ji vî lawikî re çê bike! Qe rabe xwe biavêje camêrna! Ev lawik mir!...

Mîrik vê carê erza jina xwe nesikand. Hema zû ji nav nivînan rabû û hebkî lampe bilind kir. Cigarek qalind pêça, vê xist û li ber serê lêwik rûnişt. Dû re desîte xwe dirêjî lêwik kir û ji jinikê stend. Lawik bir ber lampê û lê nihêrî. Ruyê lawik zer bibû. Gava ku digirîya, wek darekî hişk dibû. Lê girîyê wî ê îşev ne wek girîyê tu şevan bû. Ji girîyê her roj û her şev cihê bû.

bû ser xwe û çû derî vekir, da bi şewqa rohnayiya ji der ve, hebkî hundir rohnî bike. Barana ku dihat hîn xurtir dibû. Ewr ji jor de weke zihakî ber bi rojava de di-kişîya. Girê-gir û şîrqa-şîrqa asmana qidûmê mirova dişkand. Ji xwe her carekê ku ewran bîrûsk vedida, weke şîşek ser li dilê mîrik keve. Çavên wî fireh dibûn û tırsa mirinê dikete dilê wî.

Mîrik dîsan derî girt û bi destpê-lînkê li hestê xwe geriya. Hestê xwe li ber nivînê xwe dît û vêxist. Jina wî lawik di dest de û xwe li quncika xênî kiribû komik. Lawikê nexweş her digirîya. Ev deh rojêن wî bû, ku pêsîr nexsistibû devê xwe. Carna ku diya wî bixwesta pêsîrê têxe dev, Qîrin pê diket, digirfa û li ser piştê lal dima.

Gava ku mîrik di bin şewqa rohnayîya heste de, jina xwe û lawê xwe di wê rîwşê de dît, weke ku agir têkeve dilê wî, dîsan ji kerban hêşir ji çavan hat. Dû re daqûl bû û bi heste sobe dada (vêxist). Ji xwe êzingên wan ên ku mabûn hew ew bûn. Dû roj berê ew êzing xistibûn sobê û li bendî rojek pir sar û dijwar sekinî bûn. Sar û seqema herî dijwar hîn mabû. Lê ji ber ku don di lempê de nema û hundir tarî bû, mîrik ji bo ku hebkî hundir rohnî bike sobe vêxist. Deriyê sobê ji vekirî hîşt, da ku hundir baş rohnî bibe. Ezingên di sobê de hişk bûn. Gava ku mîrik agir berda-yê, alawiyê avêt ser çavên wî û hin ji porê wî û simêlê wî kizirî.

Di wê biskê de hundir hebkî germ û rohnî bû. Şewqa sobê li dîwîr wek helkanê dihêjîya. Mîrik ber bi jina xwe çû û li ser tutikan rûnişt. Dû re lawik ji destê wê girt û bi dilşewatî lê nihêri.

Spîkêن çavên lêwik zer bûbûn.

Çêvên wî carna fireh dibûn û dihatin girtin. Wek ku girîya bû dengê wî ketibû. Mîrik serê xwe hejand û got:

- Welleh ev lawik dê bimire, xelasîya wî tune!
- Jina wî peyva wî birî,
- Qe bila devê te ji xêrê vegere, çi ye tu qala mirina lêwik dikî!

Mîrik tişt negot. Lawik da destê jinikê, rabû ser xwe û cigara xwe bi agirê sobê vêxist. Piştî ku du hulm li ser hev li cigarê xist, li jina xwe zîvirû got:

- Ez e rabim herim mala cîra-nê Seydo hin êzing û don deyn bikim. Ku ev soba me bi qede, em ê bê agir û rohnî bimînin, emê perîşan bibin.

– Tu zane ku te bivê here.

Her ku diçû Şîrqîn û gire-gira ewr zêdetir dibû. Dengê xuşîna baranê weke dengê xuşîna çemekî ji der ve dihat. Hîn ew willo bi hev re dipeyivîn, dilopekî ser serê mîrik ket. Mîrik pêşî bahwer nekir ku dilop e. Piştî ku destê xwe da serê xwe, têgîhîşt, ku bi rastî ji xanî dilopan dike. Di hundirê wextek kurt de, dilopên xênî hîn zêdetir bûn. Tew ji qorziya xênî weke ku mirov bi kulman avê birjîne, av herikî hundir. Jin û mîr bi lez firaxêñ ku hebûn dânnîne ber dilopan. Lê firaxêñ wan têra hemû dilopan nekir, pir dilop bêfirax man.

Mîrik qapûtekî leşkeran ê kevn avêt nav milê xwe û ji jina xwe re got:

- Ez herim bê ez hinek don deyn nakim. Ku dinya li me rohnî bibe, dibe ku xwedê rîkê nişanî me bide.

Jinikê piştî ku keserek kûr kişand got:

- Welleh nakeve serê min, ku tu kes vê şevê li te derî veke, lê dîsan ji here, dibe ku camêr bi xwedî ücdan derkevin. Ez e ji rabim herim ser xênî du gundoran lêxim û hinek ka lê bireşî

nim, dibe ku hebkî dilop biseki-nin.

Mîrik piştî ku di dilê xwe de axînek kûr kişand got:

- Baş e. Ü ji hundir derket.
- Piştî ku mîrik ji hundir derket, jinikê lawik di nav lihêfekê de pêça, kevnikek avêt nav milê xwe û derket ji der ve. Baran hîn xurtir bûbû. Mirov digot qey bi kuzan tê. Ji ba û baranê mirov nikanî bû çavên xwe vekira. Jinikê teneka kayê xiste destê rastê û bi mîrdewanê (sêlîm, derence) de bi jor ket. Çaxa ku gavê xwe avêt ser xênî, kevirê bin lingêñ wê şemîti û jinik ji jor de weke gomagî li ser dika çimento, ya li ber devê derî li erdê ket. Serê wê ji hev belav bû, bû meyt û li erdê ma.

Piştî deh -panzdeh deqîqan, mîrik bi çend qutik dar û bi şûşek don vege riya û di deriyê paşîya hundir de kete hundir. Ku kete hundir, zû qapûtê xwe ê ku ji baranê şîl bûbû ji xwe kir, hestê xwe ji bêrîka xwe derxist û vêxist.

Ji dengen dilopan pê ve tu deng ji hundir nedihat. Mîrik şaş û ecêbmayî ma. Hestê xwe ê vêketî xist destê xwe ê çepê û ber bi lihêfa lawê xwe çû. Dît ku lawik bêdeng li wê erdê di nav lihêfe de dirêjkirî ye. Pêşî di dilê xwe de got: "ox, qe wa bîskê xew kete çavan". Dû re weke ku tiştek niqutî dilê wî, hêdfî ji bo ku lêwik şîyar neke lihêfa wî ji ser çavan hilanî. Lêwik qet xwe tev nelivand. Weke darekî hişk rep ma. Mîrik hema rahişte lêwik bazda ji der ve û dîsan bi qerîn bang kir.

- Xatêê...Xatêê. Malşewitî-yê lêwik can da ye!
- Hîn peyva wî di dev de bû Şîrqînek ji ewr hat û birûskê veda. Bi vedana birûskê re, çavên wî li jina wî û xwîna ser wê ket. Hema bi yek derbê re qîrînek jê hat û xwe tevlî lawê xwe avê te ser wê.

HEVPEYVIN



bî fûtbollistê navdar Gûramê Sekir re

Ev hevpeyvin ji ali Temûrê Xelil bî fûtbollistê Komeke Sovyetistanê heri eyan "Spartak" a Moskovayê, ewladê kurd Gûramê Şekir Ecoêv re çê bûyê û dî Rya Teze hejmar 94-1984 de hatiye weşandin.

PIRS: Bi kerema xwe kurt xwe bide naskirinê.

BERSIV: Ez sala 1961, li bajarê Tibilisê (Komara Gurcistanê) hatime dinê. Dê û bavê min Nena Emo û Şekroê Elî berê bine-ciyê n gundê kurda yê Camûşvanê bûne (navça Elegezê, Komara Ermenistanê). 16 saliya

xwe de min koma "Dînamo" a Tibilisê ya xorta de lîstîye, werzandvanê Kîjanê fûtbollistê eyan B. Cîçînava bû. Paşê ez teklîf koma Yekîtiya Sovyet a xorta bijare kirim. Dû wê yekê m re min koma "Mêtalûrga" Rûstaviyê, "Torpêdo" a Kûtaisiyê,

"Dînamo" a Moskva yê de lîstîye, eva saleke, ku hatime "Spartak" a Moskva yê.

PIRS: Koma we îsal pêşvanîyê de ciyê duda girt û hêjayî medalî zîv bû. Em we bimbarek-pîroz dikan.

BERSIV: Sipas!

PIRS: Fûtbollistê weyî herî hizkirî kîye?

BERSIV: Yûri Gavrîlov. Merî hewas dike pêra bilîze. Dema lîstikê carna usa hê sa, usa nazik ji halê giran derdikeye, ku mirov şâş û metel dimîne.

PIRS: We Yêrevanê de bi hesabê 2-0 ji "Ararat"ê bir. Wê serketinê de keda we jî hebû. Gavrîlov goleke xwe bi hereketê we lê xist. Bilî wê , we çend cara dûrva top zerp berbi dergê "Ararat" ê xist. Diktörê (peyvkarê dûrditînokê jî, ku bona temâşevanê Sovyetistanê dîyar dikir,

got, wekî yê herî baş komêda îro hûn dilîzin. Hûn bona vê ser çi fikrêne?

BERSIV: Min bi qewata dubareva dilist, ji ber ku min zanibû, ku gelek kurd niha dîna xwe didine lîstika min û min dixwest li ber wana rûspê derêm.

PIRS: Wê 28 ê meha november bajarê Tiblîsê de bona fîncana ÜEFA ê koma Almanya Rojava-yê Kolin "Kyolnê" ra lîst û 1-0 jê bir. Derheqa wê komê de hûn çi dikarin bêjin?

BERSIV: Ew komeke zore, serketina me ji me re hurmet û sianetê fine. Gava koma me, xwezma, di bajarê Tiblîsê de dilîze, meferen mala me, ilahî Kewa pîrka min a 80 salî guhdar dîna xwe didine lîstika min, Dibêjin, gava ez deşteda dikêvîm, pîrka min gelekî ber xwe dikeve.

PIRS: Hetanî niha we kêjan wela de lîstîye?

BERSIV: Yûgoslavia, Italia, Çekoslovakia, Macaristan, Yûnanistan, Sûriya, Almanya Rohilat, Angola û Tirkîya yê re.

PIRS: Gelo we kêjan idara xwendinê temam kirîye?

BERSIV: Min sala par fakulta Universiteya Tiblîsê, ekonomiya dewleti xilas kirîye.

PIRS: Hûn wextê xweyîaza çawa derbaz dikin?

BERSIV: Pirtûkên derheqa evînê û ên derheqê gelê xwe de dixwînim, dîna xwe didime filmâ. Di van axîriya de min dîna xwe da filmek dokumenter "Em Kurd in" ku derheqa gelê min de bû.

PIRS: Gelo tu : zewicî yî?

BERSIV: Çendekî şûnda, "bajarê Tiblîsê wê şiraniya min bixun, paşê ji emê dewateke kurdî bikin. Ez we gişka teklîfî şaya xwe dikim.

— Bira pîrozbe gelek sipas!

rûresîyek di ya tirkiyê

Me dî hejmara şesan de mîzginiya zarokxana kurdan li Stockholmê dabû. Lî pîr derbas nebû dijminê gelê me hovitiyek xwe ya di eşkere kîrin. Rejima faşist bî lez Konsolosa Swêdi li Enqerê û Wezareta Derva li Swêd "ziyaret kîrin" û bêhuzûriya xwe diyar kîrin. Em di rojnama Swêdi Sv. Dagbladet de dixwinin, ku Kon-solosê Tirkîli Stockholm Haluk Özgül ji berpirsiyareki Wezareta Swêdi re dibêje: Li angori hukmîn bingehin ya Tirkîye zimanek tenê li Tirkîye tê axaftin, ew ji Tirkî ye. Ji ber vê yekê dîvî dî zarokxanê de zimanê Tirkî bê xwendim.

Bersiva Sîlya Strömberg, di Wezareta Perwerdekariyê de tê diyarkîrin. Siyaseta Swêd bî carek vekiri ye. Em ji zimanê zîkmaki, ku li malê tê axaftin bî rî dîkevin.

"Bör tala bara turkiska"

Kurdiskt daghem irriterar Turkiet

Ett kurdiskt daghem med 15 barn från några månader upp till sju år i Tensta i Stockholm har väckt de turkiska myndigheternas irritation.

Både svenska ambassaden i Ankara och UD i Stockholm har uppväkt området om daghemmet innanför en form av separatism. Barnen påverkas från spådaste åldern.

Ambassadör Özgül understreker att någon officiell protest inte avgöts.

— Min uppvisning i UD var snarare ett påpekande av hur vi ser på frågan.

Pressombudsman Bertil Jöbeus, UD:

— Ambassadör Özgül har upplysts om att daghemmet i Tensta inte är en fråga för regeringen och UD. Den hör hemma under den kommunala självstyrelsen.

Hemspråk i gymnasiet

I Tensta pågår också — i kommunens och socialvärldens regi — ett kurdiskt familjehemsprojekt. Invandrare uppsöks av kurdisktalande perso-

nar barnomsorgsassistent Ulla-Britt Eriksson.

"Barnen påverkas"

Turkiska myndigheter menar att det kurdiska daghemmet innebär en form av separatism. Barnen påverkas från spådaste åldern.

Ambassadör Özgül understreker att någon officiell protest inte avgöts.

— Min uppvisning i UD var snarare ett påpekande av hur vi ser på frågan.

Pressombudsman Bertil Jöbeus, UD:

— Ambassadör Özgül har upplysts om att daghemmet i Tensta inte är en fråga för regeringen och UD. Den hör hemma under den kommunala självstyrelsen.

Hemspråk i gymnasiet

I Tensta pågår också — i kommunens och socialvärldens regi — ett kurdiskt familjehemsprojekt. Invandrare uppsöks av kurdisktalande perso-

nal och får hjälp med olika praktiska problem.

Nio elever i gymnasiet och ett 80-tal i grundskolan i Stockholm får sedan 1981 minst två timmars undervisning i veckan i sitt hemspråk kurdiska.

— Vi har sex läärare i kurdiska som reser runt mellan skolorna, berättar rektor Sven Gullman (förutn kurdiska ges undervisning i 59 andra språk).

Tänker på språket

På utbildningsdepartementet känner man inte till några tidigare liknande diplomatiska uppvisningar. För exempelvis jugoslaviska invandrare sker undervisning på ett flertal hemspråk — utan invändningar.

Svenska politiken är helt klar, förklarar departementssekreterare Silja Strömberg. Vi tänker inte i nationalitetsstermer utan undervisar i det språk barnet använder i sitt dagliga umgänge med föräldrarna.


Omar Magnergård

Ev nivîsa dawi bû ku
Mamoste Cigerxwin
dabû Berbangê.

JI NIVISÊN MINORSKI

XO Û exlak

Cigerxwin



Sê hene ko di nav kurdan de cî-kî bilind girtine ko ezê ji paşve bixwazim yeka yekan hersiyan bidim xuyakirin:

1. Jîndariya sedêن kevnare ko derebegêن Kurdistanê hebûn.
2. Destûra eşîri dinav kurdan de.
3. Kurd çawa têن xapandin li ser destêن tirkân.

Aboyan dibêjî: Kurd gernasêن rojhilatin. Heta îro jî hêj ev gotin di cihê xwede maye, xesma kurdêñ malmezin û hêj wekî sedêñ navîn ji çaxêñ kevnare ko di Kurdistanê de bûn mane. Bê gomane ko kurd ne weke fârisan rûqermiçî ne, bi derd û kulin ko di Ewrûpa de ev rûqermiçandin rengekî Gernas-Farisa bû û ji wan re pesnekî ne qenc û kemasî bû.

Lê tevlî jê jî mirovêñ mezin di sedêñ navîn de ko weke Baronêñ ko xwe bi bay û kalêñ xwe mezin dikirin û xelk xwedî dikirin û ji sitran û nêçîrê hez dikirin û bêş ji her tiştêñ ko dikete ber çavêñ wan distandin û ne xema wan bû ko, bi şev derketa û berê xwe bidana bajarêñ mezin û heçî ne li gora dilê wan bûna dukuştin û kengî fersende ji xwe re bidftaya diçûn. Bê zentiyêñ fileh kêm talan dikirin.

Derebegêñ kurd eger ne wek derebegêñ Ewrûpa ne, ji ber ko sitiwe xwe ji Tirk û Faris re xwar nekirine, abora welafe wan gelek baş û hêjayî bû û dan û sitandinê wan bi cotkarêñ wan re xweş bû, weke leşkerekî gundi li wan dinerin.

Kurd gelek bi kok û bingehê xwe dilxweş û payedar dibin, carekê min dara malbata axayê hindamekê çêkiribûn, çawa ez û ew gihane hev, min xwest ko ez bipirsim: ka çi di navbera pismam û pismam de heye? weke em bêjin: Bapîr axa, pismamê Bayiz axa ye, yan Pêrût axa ye?

Bivî awayî gelek dilxweş dibû û liser vê yekê, ji hawîr ve deng bilind dibûn û dawî nehat.

Li nav kurdan gelek mirovêñ xwendî jî hene ko heta deh, pazdeh, bay û bapîren xwe ji ber dizanin. Dixwazim bidim zanîn ko çawa di dîwanxanêñ mezinêñ kurdan de xweşî û şadî çê-dibûn: serdarê Mukrî em xwestin cem xwe û di sala 1911 de em çûne Mokan mala wî, lê çawa em gihane nêzikî gund, her çend deqîqe diçûn, selefek siwar dihate pêrgî me, paşê kurê wî hat û silav kir û li ber gund ew jî hate pêrgî me. Bindest û gundiyan xwarinêñ terzaterz, pir li bustanekî xweş ko çend çadir li hawîr Hewzekî vegirtibûn û

piştî xwarinê çayê ji mere anîn û careke dî xwarin ji me re anîn û hemû tevlî dengê mûzika û sitranê dibûn. Ü xwarineke mezin ji karker û rencberêñ xwe û gundiyan re jî dansbûn du masiyêñ ko ji bo me girtibûn, çêkiri-bûn, ji bûr nakim...

Ji hevdûkirina cugrafi, û destûrêñ eşîri van tevan nehiştine, ko rewşa wan ya civakî berebê ş herî. Kêm ji van di gundêñ mezin û bajaran de rûdinin ji bo ko em karibin kurd nasbikin gereke em li her tiştê ko damara xêr û şer jê derdi Kevin binerin.

Kurd gelekî ji malbat û eşîre hezdikî xwe pêve girê didî, ko ev tişt ji bîrbirina wan ya mirovperwerî bê tire, herweha ji piratiya olperestî jî bê tire, çawa ko ji welatperewerî û miletperweriya wan jî bê tir û xurtire em bi ku de diçûn, evreng jîna civakî bû û destûr û qanûn li pey me bûn ji bo ko me biparêzin, lê kurd guh li ci dikî, li kê dikî? ne guh di-dine dewleta tirkî û ne jî guh di-din dewleta farisi ko herdû jî sê-fil û weza bûne, xurtî û yekfî herdû jî bi destêñ xwe girtibûn, malbateke tenê, bi destê xwe girtibûn, malbateke nikaribûn xebatê di riya mayin û hebûna xwe de bikin ko ne diriya eşîre vê bûna. Her wekû kurd tenê dixwazin xwe biparêzin, di şerê

tirkan yê vê paşiyê de bi gernasî di ber parastina eşira xwe de şer dikirin û bê van şer dikirin.Lê diber dewleta tirkî de, li General Efiryanoğlu binerin û pi-rê-n caran ziyan li kurd dibû,di serê pêş dest bi êrişan dikirin, lê zû direviyan û ne tenê gundi-yê-n reben belkî ji leşkerê tirk ji talan dikirin û xwe bi paşve di-kişandin.

Gereke em zanibin ko miletê kurd tu caran xwe ji welatê tirk ya ji welatliyê-n tirk ne hejmar-tiye.Yezdan Şer di sala 1877 de di şerê Qerem de,ko pi-rê-n kur-dan ji dervê welatê xwe şer dikirin,leşkerê kurd heldiweştya û dişkest, tevlî ko şêxen olperest nav diwan didan û ew tajotin şer. Lê serdarê Firqê qumandarî Faiq Paşa gelek ji pergala kurda bê hêvî mabû û dawî ez bawer di-kim kurd tu carî xwe bi Tîrkiya nûjen ve girê nadîn eger şerê me û tîrka careke dî destpê bike,şer-ê 1914 daxwaza wiye.Lê eger em bixwazin birika vê awirê bi-nerin, gereke em li çîroka gerokê Firansî ko Pojolan dibêjî: di çaxê êrişâ Hafiz Paşa di sala 1837 de axayê eşirekê ko hêj 30 salî bû û gelek ciwan û şêrin bû û hevsarê kar bi xurşî xisti-bû destê xwe û bi peyayên xwe gelek payedar dibû û digot: nax-wazim yekî dî mezinê hin mirov ko wî nasnakin û ev gotin çend caran dikir û gelek xwe pê ser-bilind û rûmetbend didî,Du rojan liberdan lê kirin nekirin ,ni-karbûn wî ji vê awirê vegerînin û çawa hate dîlkirin,qelûna xwe vedixwar û gelek giran û xwegir-tî bû. Lê roja siyem paşayê xwînxwar,se temkar ew xiste be-roşek ava germ,lê kurdê gernas bi xurtî چەde ma û xwe bicarek şaş nekir heta ko şerê xwe di nav avê de danî.

Ez dixwazim serpê hatiyeke dî di biwara gernasiya kurdan de bibêjim, ko min bi çavê-n xwe ditiye;

Axayê eşira Şekaka-Cewher Axa ko birayê Simko axayê me-zin bû û li hindama Çixrika hêla Selmasê rûdiniş,berî pazde salan bicarek guh nedida dewleta fari-sî ji bo talan ji çiyê dadikete deştê.Lê tiştê kesmedi eve ko rebenê-n kurdan gelek dost û dil-xwazê-n wî bûn ji ber ko dewle-mend talan dikirin û hin ji wî ta-lanî dida reben û belengazan.

Dewleta farisî dest bi xap û ri-pê-n xwe yê kevnare-nûjen ki-rin,axa kirin fermandarê ser sî-nor.Merzeban û axa jî qîma xwe pê anî û di serê pêşî de ji xwe re ev kar payedarî,serbilindî di-dî,lê berebere destê xwe ji vî karî kişand û careke dî li karê xwe yê kevnare vegeriya û min bi çavê serê xwe şerê xwe şerê navbera axê û peyayên dewletê bi nivîsaran,didî: yekî ko karibî zanibî bi farisî binivîsi,nebû ji lewra bi dizî û bi şev ristevanekeî farisî pir ko bi xwe sekreterê walî bû tamî cem xwe û wî bi xwe nivîsaren walî ji axê re tanî û nivîsaren axê ji walî re dibirin,yanî ji herdiwan re dinivîsi û veşartlyê wan dizanibûn û ji walî re hin nivîsar tanîn ko haya axa jê nebû, goya bersiva wan nivîsaren ko bi roj ji axê re ji cem walî dibirin û bi şev peyayên walî ew girtin û kuştin. Ü dawî waliyê Azirbeycan, bi qu-ranê ji axê re sund xwar û ew anî tewrê zê û min, dî mezinê kurd û heşt peya pêre bûn ko di-rexta de rapê çayî bûn û kurd gelek giran û bê tirs bûn, tenê çavê-n xwe nebirin ser hev û tim li mezinê xwe dinêrîn,Lê dawî nikaribûn wî biparêzin û bi bê-bextî hate kuştin.

Axa li ser pê pelûkên qesrê di-gel walî-generalê farisî rawestî ya bû ko general dixwest xatir jê bixwazî û axê birê bikî,lê wî berî hingî vilik gerandibû û çend sed mirov xistibûn hindirûkî û çawa ji axê dûr ket, gulebaran lê girê dan û kuştin û kurdan

dest bi şer kirin.Piştî kuştina axê ji desthilanîn neketin xwe neşerpilandin û bi derve de ne-reviyan, hindirû de şer kirin.Ji lewra leşkerê dijmin gelek ditir-siyan û ji hev ketin.Tevlî ko şer giran bû jî, lê hindik mabû ko General bixin destê xwe û gelek ji dijmin kuştin ko cendekê-n wan ketin wê navê û kurdan xwe dane hev û ketin odakê û heta şev kete ser wan şer dikirin.Lê dawî çûne ser pişta hev û dibixêrikê ve derketin ser piş-ta odê û hevalê xwe yê birîndar hildane jor û dawî derketin ser xanî û di ser xaniyê cînarân ve xwe berdane nav bexçakî û da-wî ketin kolana û bîvî rengî ji Tebrizê derketin.

Roja dî siwariyê-n faris ketin ser şopa wan ko wan jî bikujin.Lê wan siwar xapandin hemî dî girtin û tevlî hesp û çekê-n wan birin gundê Çixrika.Peyayê-n bi axê re heşt bûn,du mirov ji wan hatin kuştin û şesa xwe parastin û herdiwê-n kuşti Ceger axa bi-darve kirin,ko li ser derê general hatin bidarvekirin.

Roja dî rojnamê-n Iranî li ser vê serphatiyê bi payedarî nivîsin û tişteki rîzanî dîtin.Piştî pênc salan li gundê Kotor min ev peyayê-n gernas dîtin û hin tiştê-n dî min ji wan bîhistin, lê wê çaxê min nikaribû li Tebrîz bini-vînim.

Eve gernasiya kurd, eve liber-xwedana kurd ji lewra gereke ci-kesê ko bixwazî wan bikî, gerek-e sed carî hisabê xwe bikî, ne bi derewa ye ko tirk û faris vê gotina erebî dibêjin: Kurd perçak ji cinna ye ji ber ko hezar fen,fût, xap û derewan li wan dikin ko bixwazin dijminîya wan bikin.Piştî şorişa Şêx Übeydullah serdarê cengê Iranî şande pay Hemze Axa û jê re sûnd xwar û got:Heta li ser riwê qadê me tiştek bite nayê.Lê çawa Hemze Axa hate binê çadîrê wî, leşkerê serdar bi gulan ew

kuştin û serdar di binê çadîre de, di qebwê de bû,nan dixwar. Lê paşê serdar digot: min soza xwe neşikandîye ji ber ko wê çaxê ez ne li ser riwê qadê bûm.

Her weha mirovên axayên eşîran li Meyaduab bi mîvanî hatin kuştin çawa ku Yezdan Şîr jî bi vî rengî hate kuştin...

Ji ber van bêbextîyan em dikarin bibêjin:ko heqqê kurd heye tim bitîrsî û bi kesî bawer nebî û li hember hemî beyaniyan bi tirs û saw bî,xwe ji wan veçinî.

Son dibêjî û rast dibêjî ko:tırsa hertimî ji dijminan, kurd wilo kirine ko hew bikesî bawer bikin û ew hînî gernasî û sivikî kîrine, hînî çavdêriya bilind û pê şveçûyî kîrine.

Ez wî pesnê dawî ji kurd re bawer dikim û bi xurtî baver dikim.Ez carekê çûme cîkî ko berî hingî bi sê salan jî çûbûmê wî cî, ji min dipîrsîn:ka ew hespê te? û reng û rûçik û nîşanêñ wî ji min re yeka - yeka digotin ko min jî bîr kiribûn û ev li nik min ne hindike.Kurd dixwazin her tiştî di jînê de nasbikin û li riwê her kesî binerin û çî gava ez çûme cem kurdan,hin tiştîn nû di biwaran wan de bi min re çêdi-bûn, bi dehan awir dihatin riwê min û biçava ayîna min distandin.Kurd newilo perkende ne û neşî nezanin.Tenê pêşveçûna zanistî-xwendewarî û gihiştin di nav wan de bicarek kî me.

Weke ko tê xuyakirin, ji ber ko mezinêñ wan wilo dixwazin-mezinêñ wan divêñ ko tenê hînî leşkerî bibin ji lewra dibênin xort her roj bi gelte û henek ,du sed pakêtî berdidin nîşanê. Lê gelek caran di xwendewarî de jî gavêñ xwe berekêş avê tine û tavêjin, Zimanîn baş dizanîn,pîrêñ wan bi tirkî û farîsî di xwendegehan de dixwinin û baş dizanîn.Gereke em wan serdarêñ ko bi salan zimanê firansî di xwen-

degehan de dixwênin û hina ji wan dixwestin bi me re bi fi-ransî bipeyivin.

Dema Oskar Man gerok bû, li Sablax Mîrze Cewad pêre digeriya û zû hînî Almanî bû û paşê çû Berlin bi Almanî ders digotin, û pere dane hev û ji kurd û Kurdistan dipeyivî. Her wekû min vi xwe li Sablax kurdek dî ko li bajarê Nejnî-Gorkî bazirganî kiribû baş hînî rûsî bûbû. Lê kurdêñ li İstanbul yan jî li derve xwendine, ji tîrkan ne k êmtîrin û di xwendina xwe de jî weke wane.Kurd gelekî ji Kurdistanê hezdkîn, welatê wan welatê XO ye bi awayê cugraffî, newal,lat û darêñ wî hemî bi navin yan jî her yek ji wan çîrokek, serpêhatîyek li ser wan heye.

Di sala 1940 de ko me li rajêr bûn û dijwar bû ko em karibin navê wan zencîren çîya, ji Ereb û Elwara nasbikin.Lê çawa em ketin Kurdistan her tişt hate guhertin û her mirov dipeyivî çawa em gihane xortekî devlikin ko pezê xwe diçêrand, gotin ji devê wî li ser hev dibariyan û digot: li ber vî ha jinekê xwe ji devê guran parastiye û ev kevirê ha ji bo wî tiştî şikestiyê,du leşkeren dijminen hev hatin vir, fermandarêñ wan du mirov rîkirin ko qelawiziyê bikin û herdû qelawiz li vir gihane hev û xwestin ko bi navê rabin. Her yekî ji wan xwest ko vî kevirî hilgevî lê pişa wî şikest û dijminê wî êriş kire ser û herdû çavêñ wî derxistin.

Kurd ji galte û henekan pir hezdîkin,dixwazin her tiştî nas bikin. Meger ne karê wan bî jî û gelek bi karêñ xwe serbest xwe payedar û xwedî rûmet dibênin.

Ewêñ ko li ser xo û sincê kurd nîşanîne pirin. Lê pir kêmîn ewêñ ko bi nermî kurd dane ber rewşeka xwe, Pirêñ gerokêñ ko kurd dîtine. Li ser wan gelek

tiştîn hêja nîşanîne û dabaşa hin qencyîn wan kirine.Lê pirêñ wan ew tiştîn di kurdan de nebaş dîne ew nîşanîne. Ji lewra em nikarin xwe pê bigrin û bixin destêñ xwe bawerîya xwe pê bînin. Ji bo ko awira wan di serve ye û kûr nabûye û tiştîk di destê wan de nîne ko xwe pê bigrin.

Kurd zêde dijwar û bîntengin. Son dibêjî: Çendeke kurd bi rîkê de diçûn û ketin gewriya hev û her yekî digo: sitêra kelawîj di filan çaxê de derdikevî,lê berî ko sitêr derkevî gelek ji wan dinav xwînê de gevîzîn,yanî ji bo tiştîkî hêç hevdî dikujin.

Rojekê li navbera Kêleşîn û Seydika me, tiştîkî kes nedî dît. Jîneke kurd rûnişti bû û mirovekî dî kurd bi tirs ji êlevîska bû distirand û gayê wî biçûk ko barkirî bû û ketibû serjêrekî,mêrik rabû gayê xwe ajot, lê ga ne dixwast wilo sivik birê de herî heme mîrik rahişte kevirekî û li eniya gayê xwe da, lê gelek neçû poşman bû û ew dîlxweş dikir li ber digeriya.

Minorûskî didi zanîn ko mîrikê kurd zû kela dilê wî radibû û zû derdikevî û poşman dibî.Divê em hay ji xwe hebin ko di hember dijminen xwe de jî ne wilo bin.

Lê kurd tol û heyfa xwe distêñin û gelek caran di vî karî de dilhişk û sirtin.Careke Kurdish, yekî xaçperest(Mubeşîr) kuştin tenê ji bo ko wali bixevidînin, dilnexweşbikin, ji ber ko çîrok ne bi dilê wan bû, û çax û dem ji wan re ne xweş hatibû.

Bawerim ko kurd weke Elbanya ne ji ber ko li xwe xweş dibênin, ko xurtiya nîşan didin û dixwazin zanibin ka çilo gulak bivê sivkayıyê mirovekî dikuji. Hin tiştîn xemgîn ji van karêñ wan derdikevin, Sekreterê Ingilizî Mester Hobart destikê

civata encumana raskirina sîno-re navbera Tirkîya û Iran di sala 1914 de digerîya ko li cîkî xwe bi vesihênî hate birîn kirin.

Çi dema em ji kuştinê mijûl dibin gereke em bi çavê xelkê Kurdistan ne bi çavê me Ewrûpiyan lê venêrin.Kuştin ne ji kare hin mîleta ye. Lê ji ber nîr û çaxêن ko bi ser mirovan de têن û ji ber xwîngermiya welatên râjê re, ne hewcaye ko em jimara Elbanya di vî warî de bidin,nîşandin.Lê belê çawa em baş li Qafqasya, li cem xwe binerin dibenîn ko di sala 1500 de serpêhattî û kuştin çê dibin.Lê di hindama Elizabeth Pol de 389 serpêhattî dibin,yanî her roj yek tê kuştin.Bawerim ko gereke hin ji van awiran bêne guhertin.Di sala 1905 de carekê min ji dûr ve dî ko rojê kurdan êrîş kirin ser gundekî ji hendamê Selmasê yekî gundî (cotkar) pezê xwe diçêrand.Kurdan êrîş kirin ser û girtin û bi xwe re birin serê çiyayê.Me bi dûrbînê lê dinêri.Lê tiştên ko li nav gundan dibin ez bi çavekî dî lê dinêrim.Di sala 1911 de ko ez li gundê Kengerlû bûm ko dikevî hendama Selmas, kirin gazî û xor-tan kerîyê pezênen xwe top diki-rin û mîran xwe avêtin pişt çe-per û kozika û jin bezîne kolana û digirîyan.

Li vir ez dikarim bênim ber çavênen xwe ko çiqas dijwarî bi ser gundênen Ermenan de dihat li Tirkîya û bêtir, ko em dizanin Ermen destvala bûn û bi carek dest hilnetanîn.Lê gereke em ji aîlikî dî ve li çîrokê binêrin ko talan-kirin di nava rojê de didî xuya-kirin ko destûra dewleta bêkêr û gewşike ko dewlet xwe bidî alî, wê li Qafqas û Tirkmenîstan ci bibî gelo?

Ji tırsan Ermen û Aşûran xwe didane ber siya mirovekî kurd yan eşireke kurd ko kes nikari-bî wan talan bikî.Lê dizî, kurd

çi dizanin ko dizan bigrin. Ji ber ko dizî û talan pîre caran ji nezanî û hevitî çêdibin.Carekê rêberê min peya diçû lê ji nişka ve berepêş çeng bû ser pişta ke-rekê, lê piştî du saetan xwedî-yen kerê hatin û kerê xwe bê şer û pevcûn jê sitandin û birin. Lê pêşder dijminahî dinavbera rêberê me û kurdan de çêbû û dijminan bi şev deh welaqen me dizin ko bihayê her yekî ji wan 200 rûbil bûn û naçare me gote cendirmê tirkan û zû diz naskirin.Heşt ji me re anîn û dido ji xwarin. Lê bawer dikim cendir-me herdû jî ji xwe re hiştibûn, herwekû bawerim ko dizî li serê çiyayênen rût ji dizîya bajaran dij-wartir e.

REWŞA JİNÊ Dİ KURDISTANË DE

Ji bo ko karibî sênc-ehlaqê mîletekî nasbikî gereke mirov li rewşa jinê binerî.Kurd ji hemî Misilmanan bê tir di biwara jinê de başin û jin di nav wan de bêtir bi rûmet û serbeste. Jin û keç di hindirû de karê malê dîkin, avê ji kaniyê tênin, diçin, serê çîya, pez didoşin, qırşık û sergînan didine hev, tênin mal, herdem zarokênen xwe yêñ hûr hildigrin û carnan li nav kolana xwe girê didin...

Jin bêperdeye,bi mîranî di nav mîran de rûdinin, bêşerm û fedî dipeyivin, bi mîran re devjenî dîkin.

Mr. Son dibêjî: gelek caran xwedîyê malê dihate pêrgî me, eger xwedîyê malê (mîrê wê) ne li mal bûna digel me rûdinişt û mi-jûl dibû.Ne weke jinênen Faris û Tirkan û bi derew xwe pak û pa-qîj dikirin(dibênen) û ne wilohovikin. Ji min re xwarin çê dikirin, bi dilxweşî û şadî tanîne ber min, çawa mîr ji çolê dihat jinik ji cem min ranedibû heta mîrê wê hespê xwe girê bida ûbihata cem min li binê kom rû-

nîşa.Di navbera keç û xortan de perde nebû, baş hevdî nasdikîrin, bi dilketin hevdî mar diki-rin, bi awakî romantikî, dibûn jin û mîrê hev.

Berî 20 salan serpêhatiyeke kesnedî li hindama Sabrax-Mehabad çêbû keçeye Ewrûpî,dîl ha-te girtin û misilman bû ji rexê Qunsilos ve, dê û bavê keçikê çend caran li ber dîlê wê dan lê nikaribûn wê vegerinîn û bi mîrê xwe re ma.

Berdana jinê li cem Kurdish tiştekî pir hesaniye û di qasekî hindik de çêdibi.Di nav devjenî de dibêjin: Eger ne wilo bî, ya ne wilo ye, jina min berdayî bî, lê dawî poşman dibin û mîrik dixwazî jina xwe vegêrenî û gelek tê êşandin.Ev jî di destûra islamê de ne diriste ko mîrekî dînekî û bernedî, Birastî ev awa di Bajaran de gelek heye û li nik Koçeran zêde hesanîye.

Nizanim Son ji kîjan hindamê re dibêjî; lê gelek zêde gotîye. Ji ber ko pir dijware mirovek jina xwe berdi.Lê sûnda bi telaqan gelek raste, lê jin nayê berdan sûndeke rîjî ye. Ji bo xurtiya gotina xwe wilo dibêjî tevlî viqasî jî ew mirovê ko jina xwe berdidî yan bi telaqan sûnd dixwî, ne gelek birûmete, kurd ji mirovîn wilo heznakin û kenê xwe pê dîkin.Lê min jî bîhîstîye ko li Kurdistana Iranê Deştalacanê wilô li dîwanxana jinênen xwe difrotin hev lê ew jî bi awakî olperestî ye. Di ola islamê de eger mirovek ji jîna xwe re bibêjî: eger tu sed zêrî, sed mecidî ji min re bêñî, tû ji min berdayî ye, ca eger jinekê yan yekî sed zêr yan mecidî dane mîrik, yan dane jinikê û wê da mîrik ev jin tê berdan û gelek caran li oda ev tişte ha dibin. Lê li cihêñ dî min nebihîstîye.Ji ber ko ez nizanim, ko Mr. Son ji kîjan hindamê re dibêjî ji lewra nikarim bibêjim derewe.

ÇOPİ

Govendeke kurdî ye, ko jin û mîr bi hevre dîlanê dîkin, çindîka tavêjin, heldipêrin. Lê dikarim bibêjim ko govendê hemî jîn û mîr bi hevre dîlanê dîkin. Lê tenê hin bi lotik hene ko hemî jin nikarin têde bîlszin. Lê çima dibêjin Çopî? ji ber ko miorvek çokî dîki bin çengê xwe û serê govendê dîgrî û dici yan ji çep diçin. (Cigerxwîn) Mr. Son dibêjî: yekî derebeg (axa) carekê ji bo min govendek lidar-xist û jin û mîrên gund hemî ketin govendê û li ser dengê def û zirnê dîlan dîkirin û heta êvarî govend gerandin. Li nav kurdan jin xwedî keyane û gelek caran kur li ser navê wê tê navkirin. Weke Bapîr çâcan, ko Çaçan

navê diya wi ye û gelek navê û dî wilo hene û gelek jin bûne mezinê êl û eşfran. Derebegî kiri-ne û heta bûne padîşah. Dema ko tîrkan welatê Hekarî xistin bin destê xwe jinekê fermandarî lê dîkir, Hartman.

Min Adile Xanim Jina Osman Paşayê Caf diye ko li Helbçe rû-dinişt û di sala 1914 de ew mezina welêt bû. Ji ber ko mîrê wê ne li mal bû û Mr. Son bi navê bazirganekî Iranî pêlakê di Qesra wê biçûk de maye û dabaşa wê nîvîsiye û gelek pesnê wî didî û dibêjî: tevlî ko fermandarî û karê welêt jî dîkir wilo jî weke jinan karê mala xwe jî dîkir, qumaş dîkirî û her tişt dîkir, çavdêriya berdestî û navmaliyan jî dîkir. Lê tîrkan serkarekî xwe têkirin Helebçe, fermandarî ji destê wê derxistin. Ji ber ko min hin diyarî ji kurê wê re şandibûn bi zimanê firansî supasen xwe jî mir re rîkiribûn. Carêkê tevlî keçen xwe hate dîtina min. Lê dawî hate zanîn ko xortekî kurd jêre bi firansî nîvîsi bû, ko wî xorî li Senanduc li nik Katolîkan bi firansî xwendibû.

Xatûna Helebçe geleki ji wê jinika Ewrûpî ko bi me re bû hezdzikir. Ew bi xwe dihate nik me ko dixwest me bibêni. Paşê ewê ñ dî jî dihatin cem me ji me re mast, tû, hêk, tanîn. Gotinek ne xweş min jê ne bihistî û min nedî ko keniya ye. Hebûna me li wir cihê şadî û dilxweşîya wan bû, em vedixwendin ser xwarinê, diyarî ji me re pêşkêş dîkirin ji kar û hêviyêñ xwe mijûl dibûn...

Kurd ji zaroyêñ xwe pir hezdzikin. Li hawîr her mezinekî gelek zariwêñ wî têne xuyakirin deh, diwazde, nêr û mîne. Pirê caran dibêni ko kurdekî bi destê zarokeke xwe girtiye, em di cîkî teng de derbas dibûn min du tişt di riya pez de dîtin, kurdekî reben cotkar kêmkinç reben bû, zarokek di nav hin paçikên kevnare de pêçayî, di ber şırqa wî de bû û jina wî li pey wî bû, bi rûkî xemgîn diçûn, xuyadikir ko zaroka wan ji xanî ketibû û gelek êşîya bû, dixwestin bibin ser dekor ko li gundekî nêzîkî wan bû. Çawa em dîtin ko ewrûpîne, bivê, nevê dekorin ko xelkêñ rojhilat wilo bawer dîkin û çawa em dîtin jinikê bi dilovanî xwe avête piyêñ me ko ramûşî, hêvî ji me dîkir ko em kurê wê ji mirinê biparêzin. Di vê rewşê de gelek tiştêñ rast û xemgîn têne xuyakirin. Hatte bîra min ko kurd hemî ji tirs, mirinê bigomannin. Weharenge ji gotina axakî hate bîra min ko digot: mirin di nav nîvînan de kêmasiyeke mezine, eger zanibim wê mirin bê, bere bi gulakî bî. Gava min hilgirin bibin gund wê hemî li ser min dilxweş bibin, ko weke divabû hatime kuştin. Diriste ko Kurd bi vê felsefê hatine avdan lê ji vê jinikê dihate zanîn ko gelek dilovan û mehrebane.

Em nikarin bi tevayî, ayîneke tevayî ji sînçê kurd bistênin, ko perçê bû û cugrafiya wan jî hatiye perçekirin. Xwendewariya wan ya tevayî nîne û ne weke

hev û ne bi heve ne, ji lewra em nikarin rewşa wan birast û ronî bidin xuyakirin. Miletetkî ko bigir hêj lê nehatiye kolan û tiştek li ser nehatiye nîvîsandin.

Bâse ko em ji Sînç, exlaqê kurd û newekheviya wan bi hevre û li gora dan-standina wan bi mileten hawîr wan re û xesma bi fileha re mijûl dibin û bidin xuyakirin.

Bê gomane ko ev mileten biyanî jîneke civakî yekane derbas-dikin û adet û teqlîdîn wan nêzîkî hevin, meger heta bê dewlet bin jî. Lê kurd li Suleymanîyê, Sawçiplaxê ji bil wan jî ji kurdêñ hindamêñ mayin çê tir naziktirin. Ew cihêñ ko li ser gernasî û ser mezin bûne weke jîndariya Azerbeycanêñ tirk û Şêê, Ermen, Kurd bêkêr kirine û du tişt ji kurdan afirandine, hin ji wan bersiva lêdanê bi lêdanê dibin, û ji ber belengazî û rebenîya xelkêñ nav wan diku-jin, talan dîkin, dixwazin wan bicarek winda bikin.

Bawerîya ko dibêjî: gereke xurtî bi dilovanî û wekhevî bî ji bawerîyêñ kevnareye û gelek bilinde. Lê em nikarin diçaxekî de ko mirov bûye gur û bihev ketiye wilo dibêjî û kêmasi û rebenî ne tenê mirinê ji xwedîyê xwe re hildigrin, belkî jî mirovêñ setemkar bê tir bi ser zor û setemê de tavêjin, tajon.

Dewleteke xurt tenê dikarî reben û bindestêñ ji zor û setemê biparêzî û li rexê wan rawestî, bi destê wan bigî û kurd û gelêñ di nav wan de li hevragirî. Lê dewleta farisî gelek weza û sêfile heta nikarî kurdêñ misilman tenê jî lihev ragirî, ji serhev bidê alî. Lê Tîrkiya ew kurdan bi ser Ermenan de tajoyî û herdem wan berdidî pêşîra Ermenan û divî warî de ola İslâmî bi destê xwe dîgrî ko karibî kurdan bixapêñî.

BO XEBATA ÇANDI

M. DERSİMİ

Jı destpêka jiyin a komelî vê de tu cimaetek nine ku xwedi çand û hûnerek nebe û li gor rewş û pêşdeturiya komelê hînek xisleten xasimayı yêne wê berçav nekevin. Çand ji yekkek ji wan e û her dibe û pêşda diçe.

Bili tiştêntabii yêne ku berhemê efraneri û xebatê mirovi ne, çi kîlam û stran, çirok û destan, her cure helbest û wêne bin çi rîbaz û destik (alet), teknik û makine bin, bî giştî naverokê çand an ferhenga gel pêktinin. Helbet ev, yekcar û xwe bi xwe nehatin pêş, xwedi dirokê dûr dîrêjin. Wek zu de hatiye gotin gava ku meriv li ser çand û taybetiyen din ën komelê radîweste pêviste ku pêkhatin, guhastin û pêşdeçûna jiyina komelê bî kurteberi, dirok û xet û meşina civaki bigre berçav û bi vi awayi lê hûr be. Heke usa nekin wek her pursek pîrsen ferhengi ji bî başı nayen vekolin, bêkeri û şashi têne pêş û meriv xebatek bêçr ne û bê mebest de difetise. Wek tê zanin ji koma ewlin vê de diroka mirovi bî gişteberi bûye danoxê koleti (dili), feodali, sermiyani û sosyalizmê. Heya xwe gîhandiye sosyalizmê cure cure çin û tebexeyen civaki li ser de hatine; Wan zebr û zengek bê hempa pêyakiriye. Û bi tevayı li ser jiyina komelê de hîkm û zagon pêkanine. Bivi awayi xwestine ku serkariya xwe û berjewendêñ xwe her bîdominin. Bona vê yekê wek çiniek serkar ji xwe re çand û rewşek civaki çêkirine û xwestine ku komelê li gor dinyabiniya çina hakim perwerde bikin û bielminin. Serkariya koledara û derrebege sedin sal berdewambû û hin ji paşmayiyen wan di gelek

cihêñ dinê de berçav dekevin û dijin. Jixwe sermiyani an hîkm û sazûmana burcuwazi ji piraniya dinê de her jiyina xwe didomine. Diyare ku ev çinêñ kedxwar û kevneprest wek her warê komelê li ser çanda netewe-yek de ji kariger bûne, û ev rewş û bûyera hin ji negîhişîye dawiyê. Rastiye ñin ji ev e ku feodali ñi ser koledariyê de, sermiyani ji ñi ser feodaliyê de hatin. Lî, van riş û rûhe çand a sazumana berê ji bini ve neşikand û hîşk nekir. Tiştêñ ku kêri wan dihatin ew parastin. Bi vi teheri ferhenga çinêñ kedxwar û zîlimkara ñi rewşek nû de her berdewam kîr.

Ên ku xwedi çand û hûner in ne tenê çin û tuêjên serkarin, çin û tebexeyen xebatkar ji xwedi ferheng û awaz in; ew ji derd û kulen xwe bi kîlam û stran, çirok û destan, govend û dilan ve bîlind dîkim û kîrine. Lî, çanda gelê xebatkar tûştek resmi nebû giraniyek bi hêz pêyda nekir. Disa ji ferhenga çinêñ bindest û hejar li gel xwedihukma her bû û xwe parast. Ev çanda pêşketi û demokratik e û bingehê wê ji aliyê dinyabiniya gelê xebatkar ve hatiye avêtin, û pîrsen wan ën civaki, çandi û hemû derd û têbînyen wan ñi efrandinêñ çandi û huneri de hatine ziman. Nişanderi rewşa komelê ne, û diroka xebatkara û serhîldanêñ wan têde dixuyen.

Kes û komen ku xebatek peşketi û şorîşger de cihê xwe dîgirin û dixwazin çinêñ bindest an neteweyek bindest ji zîlm û kedxwariyê rizgar bikin, divê ku çanda gel de her çi ku pêşverû û demokratik e, xwedi wê derkevin û kêri xebatê û şorîşê binin.

Diyare di xebatê rizgarkırına gel lek koloni de çanda pêşketi û demokratik cihek giring û bêhempa distine. Pêkhatina hestê welatparê ziye tenê bî dirûşmêñ siyasi ve nabe, hewcaye ku xebata çandi ji bêkirin. Gelek bîndest, ta humber xebatê siyasi xebatê çandi neyê kîrin nikare bî hêsanî û demek zû de ji xew rabe û barê giran hîlde ser milê xwe. Bi kurteberi hisyarkırın û rîxistina gel de rola çanda komelêñ xebatkara divê neyê birkirin û ev pê wîstiya bê ditin.

Wek berçav dikeve hînek kes bî hest û mestî ve li ser çand de diçin, bi teherek rast û zanisti venekolinin û her çi ku berdest ket dîgirin û ji nû ve pêşkêşî cimaetê dîkin. Lî, carna ev xebata nagîhije seri, kêri armand û mebesten gel nayê. Divê ku em li ser dirok û çanda xwe bixebeitin, jiyina komelê de tu cihek tari nehêlin û ronbikin. Lî her usa ji divê ku berhemêñ diroka komelê bî başı bîn bijartîn; ën kevneprest û ën pêşketi û demokratik ji hev bîn cidakîrn. Gele tişt hene ku kêri xebatê iroyini nayen û naverokê wan bî kevneparezi ve tiji ye ango pêşdebirûna jiyina komelê de karek nebaş û xîrab pêktinin. Divê em nirxê wan pêdin û ci de bîhêlin. Lî, hînek berhem ji hene ku malê komelêñ xebatkârin û xebatê wan ê iroyini de bîkêr têñ. Divê em berhemêñ han ji bin krasê dirokê binin der û pêşkêşî gel bikin.

Çawa dixûye xebatê çandi herçend pêvist e û bî rîbazek zanisti ve xebitin û vekolin ji evçend hewcê ye. Divê em bî berhemêñ çandi ve gelê xwe perwerde bikin, bî ramanen pêşverû ve bixebeitin, hest û qalîya wê ber bî pêş bîbin. Bona vê yekê ñi diroka me yê çandi, komeli û siyasi de çi berhem û wêneyen pêşverû hene divê li ser mujul bin, bekolinin û danin pêş gel. Ne ku her tişt....

BİRİNDAR Ú ÇAVÈŞ⁴

Ahmet Cantezin

Azad go:

— Hevalno, dike em hemampi-şika xwe biparêzin. Em xwe bi-din pê şiya hemampiş. Em wê biparêzin.

Sermend: Em xwe li pê şiya rê dirêjbikin û bila dewar raste rast biçe ser kanîyê û ava xwe vex-we, wê demê hemampişa me nê xirakirin. Û em dikarin dura bileyizin.

Bêrivan: Guhdarî min bikin! Wen em xalîya Bêrîcan ra bê-

jin, ku ne bû em ber wê bigerin, ku dewara xwe naha neyne ser kanîyê. Bila dora êvarê bîne. Heya êvarê emê gelek bileyizin.

Birîndar: Dike em hemampişa xwe bi bawetekî xweş biparêzin. Ya baştır ku em xwe bi pê-şiya hemampiş din, ku em destê n hevûdu bigrin. Û xwe wek diwarekî bidin peşîya hemampi-şê. A naha bê vê çara me nîne.

Xalîya Bêrîcan bi tev dewarê xwe nêziya kanîyê dibû. Her çar hevalên ku hemampiş çêki-ribû, ji bo parastina hemampiş mîjiyê xwe dişxulandin. Tu ke-sî xwe şas ne dikir. Lê lezdiki-

rin. Berxwe didan ku bi babete-kî listika xwe biparêzin. Dewar nê zî kanîyê û hemampiş dibû. Zaroka lez dikir. Xebera Bê-riçanê tu ne bû ji hemampiş. Ci bi zane ku zarok dixwazin hemampişa xwe biparêzin. Her ku dem diçe dewar nê zik dibe. Zarok ditirsin.

Bêrîcan dibîne ku zarok li ser kanîyê ne, lê bi babetek din di-peyivin û lez dikin. Dura destê n hev digrin. Bêrîcan meraq dike. Xêre va zarokan! Ci bi wan ha-tîye? Ji bo ci lez dikin!...

Dem a ku xalîya Bêrîcan bi tev

dewar rind nêzîkî kanîyê bû şûnda, Bêrivan gazî wê dike:
— Xaltîya Bêrîcan, Me li vir lis-

tikek çêkîriye. Em naxwazin ku ew bê xirakirin. Ji ber wê me destên hev girtine û dixwazin lîstika xwe biparêzin.

— Listika çiye zarokno?

— Listikeke ku me bi axê çêkîriye. Navê xwe jî hemampiş e. Birîndar dibêje:

— Xaltîya Bêrîcan, bila dewar lîstika me xiraneye.

Bêrîcan:

— Başe başe, wer xuyê ku hun lîstika xwe pir hezdikin.

Azad û Sermend bi devekî dibêjin:

— Belê, belê em jê pir hez dikin. Em naxwazin ku ew dê bê xirakirin.

Bêrîcan:

— Başe zarokno. Ezê pêşîya dewar bigirim da ku ne ser lîstika we. Her çar hevala bi devekî kêfxweşîya xwe nîşan da.

— Biji xaltîya Bêrîcan, bijî, bijî.

Dewar xwe raste rast li ava kanîyê girtibû. Ji ber ku dewar tî bibû. Dixwast bi têr av vexwe.

Bêrîcanê xwe da pêşîya dewar, da ku bê avê neçe derek din. Pişa Bêrîcanê li zaroka bû. Zarokan jî, du bosta dûr hemampişê bi destên hev girtibûn. Rûyê wan li pişa bêrîcanê bû. Her çar zarokan û Bêrîcanê li çuna dewar dinêrin. Dewar jî gelek xweşik cûn ser avê. Zarok piçekî ditirsin. Lê ji ber ku dewar lîstik jî xirab nekir, pir kêfxweşbûn. Ano(seqet) kêfxweşîya wan ne temam bû. Ji ber ku dewar av vexwar şûnda dê kuda biçe! Ew jî difikirin. Ew bo tîsa hindirê wan da.

Bêrîcan li cihê xwe nêdilivî. Zarok dîsa wirg (wisa,werg) Dewar jî... Her çar hevala laşê xwe kîribûn dîwarek li ber hemampişa xwe. Destên hev xweş girtibûn û qet bernedidan. Li şûna xwe jî

qet nedilivîn. Dilê hemûya ji bo lîstika xwe davêt. Dibê ew bê parastin.

Çavê Birîndar hîn dêşîya. Ji bo ku sorbûna çav derbas nebûbû. Yek ji dema ku hemampiş çêkîrin ji erdê toz rabûbû. Dibe ku piçek ketibe çavê wî, ku av jê dihat. Lê xema wî nebû. Raste, çavê wî av jê dihat. Lê xema wî nebû. Raste, çav dêşîya, le wî dixwast lîstika xwe biparêze. Dewar hîn av vedixwar. Bêrîcanê li dewarê xwe dinêrî. Dixwest ku bizane ka dewar çiqas av vedixwe. Dem diçû. Zarokan destên hev pêht girtibûn.

Meşek hat li ser gupa Birîndar danişt. Dura bi hêdika hêla çavê wî yê ku dêse da meşî. Birîndar serê xwe hejand. Xwast ku mês bifire li ser rûyê wî. Lê mês nefiri. Mês sekînî. Mês kîfa Birîndar revandibû. Ji ber ku dema mêshek, yan kulmêşek bihata û danişta li ser rûyê, destê mirova, wê demê mirava dixwast ku wê wana kiş bike. Ji ber ku rihetî nedida mirova. Xweşîya mirova nedîçû. Mirov kare bêje ku wek mirov bê qidî qidî kirin.

Av ji çavê Birîndar dihat. Mês xwe gihad çavê ku dêse. Mês cû henda çavîya çav. Lingê xwe yê zirav kuta hindirê çavîye. Çav xurî. Lê meş nefiri. Birîndar serê xwe çend cara hejand. Mês dîsa jî nefiri. Mês wek xwarinek xweş bibîne, ketibû kanîya çavê Birîndar. Birîndar ji tîrsa lîstikê nedikarî destê xwe ji destê hevalê xwe derxe û mêsê kiş bike. Talîyê tamula Birîndar nema û li Bêrîvanê ra go:

— Bêrîvan, tu karî piçekê destê min berdi. Mêshek hatîye ser çavê min. Ez dixwazim wê kiş bikim. Bêrîvanê çavê xwe ji dewar rakir û bi lez li çavê Birîndar mîze kir. Dura go:

— Bise ku ez pifê bikim.

Bêrîvanê pifê mêsê kir. Lê bi pifika siftê ra mês nefiri. Mês ne firî û ne jî tîrsî. Bêrîvanê carê din pifê kir, lê vê carê hebekî bi hêrs. Dibê ku mês tîrsî be, wilo nebû ya mês nedifirî.

Dewarê xaltîya Bêrîcan av têr vexwar. Hingê dewar paşva çerx bû û berê xwe da reya maldîsa.

Dilê zarokan wek cara siftê, dema ku dewar dihat ser kanîyê nedîavit. Ji ber ku dewar têr nêzîka hemampişê nebû. Dewar nêzîkî du metra dûrê hemampişê hat ser avê û çû şûnda.

Zaroka xaltîya Bêrîcan sipas kir. Ew jî pir kêfxweş bû. Dewar li pêşîya Bêrîcanê berê xwe dan reya mal. Zarokan dest bi lîstika xwe kir dîsa.

Ro diçû xwarê, paş darên biheyvê. Gundî hêdî hêdî dihatin gund. Ku ro çû ava şûnda naxira gund jî hat. Ji gundîya henek li ser qelme bûn. Henek jina sîtila xwe girtibûn diçûn avê û henek jî ji avê dihatin. Kûçikên gund ji xewa kur rabû bûn. Keçîka bi tev lawika dîk û mirîşkîn xwe dikirin pîna. Duman ji rojînîn malan radibü bahî. Yêñ ku dewarê xwe kêm hatî mal meraq dikir. Zaro vê xwe ra digotin, de lê bigerin. Ji bo ku hunikî bibû jîn jî geş bibû. Dengê kilamek xweş dihat ji ser bêderêن li hêla rojhelat.

Birîndar, Bêrîvan, Sermend û Azad hatibûn nav gund. Tev zarokêñ din alîkarîya karê male dikirin.


Hindirêñ xanîya tîjîbihna şîvan bibû. Hîvê bi tev stêrkan ezman xemilandi bû. Wek keçek hevdeh salîf ku çîn dike. Gul û gupik, pel û tila, reng bi reng...

Dûmahîk heye.

biranina CIGERXWIN

Dî 1'ê Kanûnê de bî sedema 40 rojîya mamoto Cigerxwin cîvinek ji ali federasyonê li Stockholm, dî xwendegeha Vârby de hat amade kîrin, li dora 350 kes dî vê biraninê de besdar bûn.

Dî destpêkê de li ser jiyanâ Cigerxwin axaftimek hat çêkîrin. Dû re xwarin li kesen besdar hate belavkîrin. Paşê filma ku li Kurdistanâ Sûriyê dî merasima Cigerxwin de hatîbû kişandin hat nişandanê. Ev film nimûneyek û belgeyek gelek hêja ye, ku çawa gelê kurd xwedi li vi kesê xwe yê mezûn derketi ye. Li Qamışlo li dora 200 hezar kes tevi merasimê dibe, ew dibe daxuyaniyek kesnedi li Sûriyê.



Em bî navê Partiya xwe ji Federasyona Komelên Kurdîstan li Swêd, hemû Parti û kesen ku êşa dîlê me bî wefata Cigerxwin parve kîrine û ji bo hilanina cenazê wezifa dawi anine cih, sîpas dîkin.

Bila serê me hemûyan sax be!

Partiya demokrat a pê şverûyê n Kurdîn Sûriya.

**

PIRAN

Tarixê to hima nênusiya Piran
 Pirmansur'i ra ver û pey.
 Esl û feslê Qama Keyna Qirali
 û ay binan wa ewca manê,
 ma ca verdim
 dewranê verê Isay Meryemi,
 hima ma vajim
 hınzar û newsey û vist û panc dî
 qe çi ame to seri ser dî?

*

Gama kî Şarê Cori
 cor di qerteliya, ame
 ay çi roj bî?
 Eşiranê Qelbiney bî gopalanê xo
 û tifinganê kurmanciyan
 qe se kerd, çi kerd?
 Ay çi dewran bî Piran,
 ay çi dewran bî?
 Hergû roj yew qereqol teslim giyriya
 Warto ra heyani Siweregi,
 ha Zaza ha Kirdas
 bî hınzaran insan tê qelebiya.
 Rojo yew Pâli û Çewhgî dî
 sayı dekewti eşiran miyan.

Kam vano wa vajo,
 wa vajê Piran
 pey "piyanz" nê
 pey çekanê keyenan ramiya dışmeni ser.

Vat bî eylekan:
 "Pirode, paşa maşa çinno!"
 Labrê paşay bi.
 Deyirê ma zuri nêkenê:
 "Pirdê Pâli pirdo text o,
 No Ismet Paşa yew kerro bêbext o".
 Pirodayış, pirode heyran,
 Labrê paşa esto!
 Paşay kemalisti,
 bêpir û zexel,
 Kemal bixo: him takdisyen,
 him bêpir, him zexel.

Kitabê tay goniweran nusiyay dina dî
 La kıtabê Delu Fikri nênusiya hima,
 to ra Haseno Piran?
 Çıqas kî gedanê ma pey ey hewna kene zi
 Delu Fikri, delu nêbi.
 Beno kî qesabê merdiman,
 beno kî yew sadist,
 beno kî Kemalist bî;
 Labrê delu nêbi delu Fikri.
 Kam deluy şinawo bikişo
 ehendi insanan
 caran?

Terteley dewijan,
 zirt-zirtê Kemalistan reydi şî.
 şêxan û giregran,
 hinda din û diyani
 dinya ra çi nêzanaynê.
 Ü lej, ayetan û hedisan nêmaneno.
 Lej: yew goniweri kî zori şinasneno.
 Lejo bêtaktik û bêqewet,
 lej niyo,
 mîrgê vera çuman o.

Malmisanij

MASSKORSBAND

